


welat

Sal:1 Hejmar:39 15-21 Mijdar 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Rêveberiya
taybetî ne
qedera
me ye!

Rûpel 3



Polîkayên kevin iflas kirin.
TC polîtika diguhere.

Li her derê û
bi her awayî

şer

Li gor guherînê ku di rewşa şer de, çedibin, dewlet jî polîkayên xwe diguhérine û ji bo tunekirina serhildana gelê Kurd polîkayên nû dike rojeva xwe. Yek ji van polîkayan jî, şerê psîkolojîk e. Ev şerê ku heta niha bi dizî dihate meşandin, iro tê binavkirin û dibe ilana şerekî giştî. Xwediye vê senaryoyê jî MGK ye.

Iro teror, bûye hîmê jiyandina TC'ê. Ji bili terorê, ji bo hebûna xwe tu rê nabînin. Bajar, navçe û gundêñ Kurdistanê hildiweşînin, gel qir dikin û ev teror êdî nikare xwe veşere. Büyeren dawî, êrîşa ser Cizîrê û di cenazeyên polisan de êrîşen ku li Diyarbekir bi ser avahiyên partîyan û welatparêzan ve birin, mînaka şerekî giştî û eşkere ye.

Beyanêñ hikûmetê, parçeyek ji vê senaryoyê ne. Şîrîkatiya di nav DYP û SHPê de, bûye şîrîkatiya qirkirin û tunekirina gelê Kurd. Hikûmet bi nixumandina kîrinêñ daîra şerê taybetî û demegojiyan, rê li ber jenosîda Kurdan vedike. Iro, qala "paqîjiyê" ji nû ve bûye sloganâ wan. Mebest ji vê gotina "paqîjiyê" jî, qirkirin, talankirin û tunekirina gelê Kurd e.

Rûpel 8



'Biji
Şoreşa
Cotmehê'

Rûpel 4



Bi Akın
Birdal re
hevpeyvin

Rûpel 16



Diya
min û
tenûr

Rûpel 13

REWS



Abdullah Keskin

'APO û PKK'

Mehmet Ali Birand, nivîskarê roj-nameya Sabah, ev deimeke dirêj e ku li ser pirsgirêka Kurdan dixebe, bi taybeti jî li ser Partiya Karkerê Kurdistanê disekine.

Birand piştî çar salan ev xebatê xwe kirin kitêb û di nav Weşanên Milliyet de bi navê "Apo û PKK" (Apo ve PKK) derxist.

Weke tê zanîn Birand, di 1988 ande, dema ku li rojnameya Milliyet dixebeitî di çapemeniya Tirk de berî herkesi bi Sekreterê Giştî yê PKKê Abdullah Öcalan re hevpeyvînek kîribû. Roja dudulan bi qerara DGM'ê ,polisan di çap-xanê de dest li ser rojnameya Milliyet danîn û nehiştin ku belav bike. Pişt re ji di heqê Birand de DGM'ê dawe vekir û 15 sal ceza xwest. Dawe tesireke mezin li ser Birand dihêle û xwe bi xwe dibêje: "Ez careke din li ser vê pirs-girêkê nasekinim."

Di kitêbê de dû hevpeyvînên dirêjhene, bi Serokê PKKê Abdullah Öcalan re. Di hevpeyvînan de, ji zarokatiya Serok heta bi salên dibistanê, ji AYÖ-DER heta damezirandina PKK'ê gelek tişt hatine nivîsin.

Mehmet Ali Birand, di hin meseleyan de hinekî objektif e. Lê mixabin di pirs-girêka Kurdan de bi şablon û dîtinê

dewletê difikire. Li alîkî PKKê, wek organîzasyoneke "terorist" dide xuyakirin. Lî aliye din, zanînê di nava kitêbê de vê sifatê neheq û derew derdixin.

Birand di kitêba xwe de PKK'ê çawa dide xuyakirin? Ez dixwazim li ser çend nuqtayan bisekinim. PKK wexta nû da-mezi dijayedîya eşiran kir, êrîş bire ser axayan û derbêne mezin li wan xist. Di cenga Filîstîniyan û Îsraîlê de (1982) 40-50 kes bûn, bi Filîstîniya re çek hil-girtin û bi Îsraîlê re ketin şer. 12 ji wan di şer de mirin û dor li 12'an re ji esîr bûn. Di eynî demê de bi sedan milî-

din de, emê bi dorfirêhî li ser bisekinin. Ez dixwazim çend çewtiyên din bidim xuyakirin.

Zimanê Kurdi çawa tarîf dike, binêrin: "Kurdî, naşibe Tirkî, Farisî-û Erebî. Bi bêhtirin dişibe Farisî." Vê ji ku derê derdixe, nizanîm. Tişa em dizanîn ji wan çavkaniyênu ku nivîsandiye ne Mînorsky, ne Joyce Blau û ne ji Eagleton ji bo Kurdî tarîfeke wilo nanivîsin. Di nav çavkaniyê Birand de kitêba Ergun Gökdenez ji ku di nav weşanên Genel Kurmayê de çap bûye, heye. Gelo van tiştîn berevajî Birand ji weşanên ordyê digire?

Neteweperestiya Tirk roj bi roj zêde dibe. Her roj li devekerê êrîşî Kurdan dikin. Birand ji, vê rastiyê qebûl dike. Li gor Birand, PKK dixwaze têkoşînê bike şerê hundîrin. Tu objektîvîteya vê jî tune ye. Neteweperestî û nijadperestiya Tirk her roj dewlet bi xwe pompe dike.

Heta niha li ku derê Kurdan êrîşî Tîkan kiriye? Li tu deran tiştîk wilo nîn el! Îşsan dewlet organize dike.

Çewtiyê Birand mirov dikare dirêtir bike. Rojnamevan-nivîskar, ji bo çi ev xebat pêwist dît. Ji devê wî bixwinin: "Bi baweriya min civakeke ku zanibe yêni li dijî wê ci difikirin dê karibe qerarîn bi sihetir, rasttir bide." Armanc ne naskirin û nasandina PKK'ê tenê ye. Civaka Tirk wê "dijminê" xwe nas bike û karibe li gorî wê tedbîran bistîne.

Nivîskar- rojnamevan- lêkolînvan, çi bibe bila bi-be di kîjan babetê de bixe-bite bila bixe-bite, berî her-tiştî divê xwe bi xwe sînoran çêneke. Derveyî wî, ji xwe sînor û zehmetî zehf in. Mehmet Ali Birand ger xwe bi nêrînê geleki teng ve girê nedabûya wê xebateke baştir derxista holê.

tanîn PKK'ê di girtîgeha Diyarbekirê de li ber xwe dan. Bi dehan kadro, di grevîn birçîbûnê de û bi işkencyê ha-tin kuştin.

Birand tevgereke wilo çawa terorist dibîne? Ji terorîzmê çi fêm dike û kîjan kistasan bi kar tîne?

Di vê nivîs de li ser dîtinê Mehmet Ali Birand û kitêba wî bi kurtî disekinim. Ji ber ku di vê babetê dê-esas muhatab raya giştî ya Tîriyê ye. Di hin weşanên

Ciwanêñ Kurd

Ciwanêñ hêja, weke hûn dizanîn, welatê me Kurdistan di navbera çar dewletên dagirker de hatiye parçekirin. Di wê parçekirin de, maşî gelê Kurd di nav lepê xwe de perçiqandine. Ne hiştine gelê Kurd bi zimanê xwe biçeyivin, ji ber wê zimanê Kurdi ji qedexê kirine.

Ji ber hindê, ziyanan mezin ji gihaye ciwanêñ Kurd.

Ger iro, ciwanêñ Kurd li dîroka Kurdistanê binêrin dê bibin ku dîroka me tiji ye ji qehremani û berxwedanan. Her dem ciwanêñ Kurd ji bo serxwebûna Kurdistanê canê xwe fedâ kirine û di nav hêzêna azâdîxwaz de cih standine û li gor kar û hêza xwe xebitîne.

Serok û rîberêñ wan berxwedanan, berî mirina xwe, di vasiyetnameyê xwe de, her dem şîret didane ciwanêñ Kurd.

Nimûneyek herî mezin, dema ku Seyid Riza li ber mirinê bû, ev peyy ji ciwanan re gotiye.

"Divêt ciwanêñ Kurd tolê bistinîn"

Ew bi vê vasiyetnameyê tiş-

tekî geleki girîng û hêja ji me re hiştîye... Mebest û meqseda Seyid Riza, ji wê gotinê ew e, ku em ji bo maşî xwe li dijî dijminan şer bikin, ew ji me re xebateke piroz û pirr girîng e... Li destpêka çerxa 20 an, ciwanêñ Kurd ji bo serxwebûnê gelek bi hêvi bûn, lê mixabin ku xebata wan kêm réxistinî bû.

Ji lew re, gelek ji wan welatê xwe hiştin û jê dûr ketin. Li van deran ji, bi hesreta Kurdistanê bûn. Nimûneyeke herî mezin, dema ku Mir Celadet Bedirxan ji Cizîra Botan (Kurdistan) dûr ket, ji xwe re û ji hevalên xwe re ew helbest çêkir.

Em xerîb in, ne ji vir in
Em akîncî ne, ne ji dil in
Roja derba mî li dijmin bê
Gurçikîn me pola ne,
Dilîn me hesin in
Dayê, dayê hay Kurdistan.

Hema bi vî rengî ciwanêñ Kurd bi hesreta welatê xwe Kurdistan bûn.

Wek hûn dizanîn, di welatê me Kurdistan de, di wan salên buhûrî de pêşveçûnê mezin û qehremaniyê nemir hatin berçav.

A. Kadir Kasırga

Bi şoreşa 15 Tebaxê re ciwanêñ Kurd, xwe bi çek û rext kirine, di nav hêzê ARGK de (Artêsa Rizgariya Gelê Kurdistan) li dijî dijminen xwe yên dîrokî têkoşînê dikin. İro ciwanêñ Kurd xwendî rîexistinîne.

YCWK (Yekîtiya Ciwanêñ Welatparêzîn Şoreşgerên Kurdistan) di bin ala ERNK'ê de (Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan) di sala 1987 ande hat damezirandin. YCWK di karêñ xwe de riya pak û rast nîşanî ciwanêñ Kurd kiriye..

Ciwanêñ Kurd, berê xwe di-din qada rûmet û şerefê. Bi hêviyekê bilind bi dilgesi û şahîyekê ku mirov nikare bîne ziman, diçin şerê serxwebûn û a-zadiyê. Bi xwîna xwe ya sor, riya rizgariya neteweyî hin bêhtir ronî dîkin û rûmeta gelê me, welatê me diparêzin.

Serokên me yên pêşerojê ciwanêñ iro ne. Azadbûna ciwanêñ Kurd incex li Kurdistanê serbixwe û azad e dê bê dîtin. Gerek tu caran ciwanêñ Kurd, li Ewrûpa welatê xwe Kurdistan ji bir nekin û herdem haziriya vegerê bikin.

Li ser rojnameyan pesta dewletê

ji aliye polisan ve lêdan dixwe.

Berpirsiyaren rojnameyên Özgür Gündem û Yeni Ülke, der heqê van bûyeran de gîlinameyên xwe ji Serdozgeran re û Wezirê Karê Hundîrin re dişinîn. Lê hê tu bersiv ji wan re nehatine.

Nûnerên bayian, ji bo van tehdîtan seri li Waliyê Rêveberiya Taybeti dixin lê tu tiştî bi dest naxin. Ji tîrsâ kuştina xwe ev heftiyek e ku van rojname û kovarêni li jor me wan bi nav kîrine nafiroşin. Ev rewş heta kengê wê dom bike ne bellî ye. Ne tenê li Batmanê li Diyarbekirê, Wanê, Erxenê, Farqînê, Nisêbînê û hwd. li temamê herêma ku di nav sînorê Rêveberiya Taybeti de ye (bi navekî din li bakurê Kurdistanê) rewş bi vî şikli ye.

Dewlet, bi destê hîzb-î kontra, vêca dest dirêjî rojname û kovarêni pêşverû kir. Li Batmanê hin kesen ku ji xwe re dibêjin "em hizbullahçı ne" bi telefonan li bayiyan rojnameyan digerin û wan tehdît dîkin ku, hin rojname û kovarêni pêşverû nefiroşin. Di van tehdîtan de ji bo ku Özgür Gündem, Yeni Ülke, 2000'e Doğru, Gerçek, Mücadele û Welat neyên firotin, kuştina berpirsiyaren bayian, li ber guhêñ wan dixin.

Ji ber vê sedemê ji, li ser navê Şirketa Belavbûna Çapemîniya Hevgirtî (Birleşik Basın ve Dağıtım) nûnerê bayian ê Batmanê Muharrem İdman got "Ku ev rewş bi vî a-wayî dom bike em nikarin ji van rojname û kovaran hebekê ji bifiroşin û tu ewlebûn û baweriya me bi polisan ji, tune ye."

Nûnerê vê şirketê yê Elezîz Halis Öztürk ji, ji ber ku Gündem û Yeni Ülke bê dîtin, li cihekî xuyayı dadileqîne

FERHENGOK

Alav: alet, hacet, pergâl

Bergirî: Muhaftaza (savunma)

Çar sirûş: (dört iklim)

Ço: Dar

Dawer: Sembol

Drav: Pere

Engizandin: Tahrîkkirin

Erdnas: Jeolog

Erdnasî: Jeoloji

Ewle: İtimat (güven)

Hikarı: Bandûr, tesîr

Karger: İdarevan, karker

Lê ewlebûn: Pê ewlebûn (güvenmek)

Layen: Teref, ali

Layerigir: Terefdar, aligir

Peresandin: (yaymak)

Pepük: (guguk kuşu)

Penî: ekere, alenî

Nepen: Bi dizî

Nimandin: Temsil kirin, nişandin

Pengizandin: Pêkandin (sîratma, firlatma)

Pend: Nesîhet, şîret

Pêşewa: Pêşeng (öncü)

Pêşgir: Mania (engel)

Pêşgirî: (önlem, engellemeye)

Pîrek: Jin, navmalî

Pîş: Huner (sanat)

Pîşkar: Hunermend (sanatçı)

Qorzi: Koşe, quncık

Rêwingî: Seyahat, rîwîti (yolculuk)

Raxisteh: Pêşangch (sergi)

Raxistin: (sergilemek)

Salveger: Salborî (yıldönümlü)

Serîtelandin: Serîtewandin

Seyandin: Sewax kirin (sivamak)

Sirûş: Xweza, tebîet (iklim)

Tîprêzî: (dizgi)

Vêl: Fraq, tas


Xawen: Rûmet, şeref

Xwestek: Daxwazî

Yekîne: (birim, ünite)

Rêveberiya Taybetî (Olağanüstü Hal) 4 mehîn din dirêj bû.

Rêveberiya taybetî ne qedera me ye



Emê heta kengî di bin çek û potinê wan de biperçiqin?

Navenda Nûçeyan- Rêveberiya taybetî cara 16. ji hêla meclisa Tirk ve hate dirêjkirin. Her çiqas di protokola hikûmeta koalisyonê de “çespîna” rêveberiya taybetî dê ji nû ve lê bête nihertin ú çareyek jê re bête ditin” hebû ji bê destlêdan, rêveberiya taybetî ji ali partiyen DYP, SHP, ANAP û MCP’ê ve dirêjkirina wê hate qebûlkirin.

Mebûsên Partiya Keda Gel (HEP) Partiya Refah (RP), CHP

(Partiya Komara Gel) û hinek mebûsên SHP, ANAP û DYP’ê ku cw bi koka xwe Kurd in li hemberi qebûlkirina rêveberiya taybetî ray avêtin an ji besdarî ray avêtinê nebûn.

Jixwe bakurê Kurdistanê bi timî ji hêla Komara Tirk ve, bi gerînê awerte, rêveberiya taybetî û bi azîneyên (metodên) leşkeri û despotik ve hatiye idarekîrin.

Her çiqas car caran, xwedêgîravî bi “demokrasiyê” hatibe ida-

rekirin ji ev e 14 sal e ku, ev bajarên bakurê Kurdistanê, di sînorêن gerîna awerte an ji rêveberiya taybetî de ne. Batman, Çepêkçûr (Bingöl), Amed (Diyarbekir), Mazra (Elezîz), Çolemerg (Hekarî), Sêrt, Mêrdin, Dêrsim, Şirnex û Wan.

Hikûmeta koalisyonê, dirêjkirina rêveberiya taybetî bi “hebûna terorizmê” û “li herêmê tunebûna ewlekariya dewleta Tirk” ve didine girêdanê.

Bûyerênen hefteyî

5 Mijdar 1992- Li Müşê, gerilayan êrisi ser qereqola gundê Döleranç kirin, 2 astsubay (serbaz) û 2 leşker kuştin. Gerilayan dawî kemîn danin ber konvoyeke leşkeran û 10 leşker ji di vê bûyerê de kuştin.

Dîsa di cynî saetê de gerilayan di navbera Müşê û Norşînê de rê birrîn. Erebeyan sekinandin, propaganda kirin.

Li Silopî li nêzîkî tesîsa Aslan, gerilayan panzerên leşkeran xistin kemîn. Panzerek imha kirin, yek ji xesar danê û 8 leşker ji kuştin.

Li Müşê li nêzîkî mezraya Çubuklu gerilayan avêt ser şantiya dewletê û errebeyan şewitandin.

Li Qilaban (Uludere), li nêzîkî nehiya Hîlalê, 2 leşker pêl mayînê kirin yek mir yek ji birîndar bû.

6 Mijdar 1992- Li Müşê gerilayan avêtin ser navça Bulanikê. Qereqol, avahiyên dewlet û emniyetê dan ber roketavêj û gullestan, avahi gelek xesar ditin, 2 ji polis birîndar bûn. Ev êris 3 saet dom kir.

Li Mêrdinê li navça Masertê (Omertî), gerilayan êrisi ser qere-

qola gundê Xirabêkerebo kirin, 10 leşker kuştin.

Di navbera Sêrtê û Şirwanê de, gerîla errebeyek güllebaran kirin. Cerdevanek kuştin, 8 ji birîndar kirin.

7 Mijdar 1992- Li Şirnexê li herêma Besnayê, gerilayan kemîn danin ber konvoja leşkeran, ku ji Qayseriyê komando dikişand welêt. Astsubayek, asteğmenek û 7 komando kuştin 6 komando ji birîndar kirin.

Di navbera Dêrsimê û Pülemûrde, gerilayan kemîn danin ber errebeyek leşkeran, leşkerek kuştin yek ji birîndar kirin.

Li Bismilê li gundê Malatiya cerdevanek hate kuştin.

9 Mijdar 1992- Li Cizirê panzereke timên taybetî pêl mayîna gerilayan kir û imha bû. 12 tim mirin.

Piştî vê bûyerê hézên dewletê bi tanq û topan taxên Cizirê dan ber bombeyan, gelek xani xera kirin û 10 kesen sivil qetil kirin.

Li diji vê qetliamê, esnafen Ci-zirê dikanêñ xwe girtin, şoforan ji qontaxên errebeyan şefalîtin. Li

Silopî, Midyadê û li Hezexê ji, li diji vê bûyerê kepen hatin gitin û qontax hatin şefalîtin.

Li Diyarbekir gerîlayan avêtin ser navça Hêne, nêzîkî 200 gerîla êvarê kêtin nav bajêr û avahiyên dewletê tev dan ber roketavêj û gullestan, 2 polis kuştin. Avahiyâ şeymeqam şewitandin, bi şûn ve ji 2 panzerên ku ji Licê dihat hawara dewletê xistin kemîn, her du panzer ji bi tevî leşkeran imha kirin. Astsubayek ji bi xwe re birin.

Li navça Pirane (Dicleyê) xayınek ji ali PKK’ê ve hate kuştin.

11 Mijdar 1992- Li nêzîkî Dihê (Eruh), gerilayan êrisi ser qereqola gundê Yolkesen kirin. Astsubayek û 5 leşker kuştin.

Li Mêrdinê li nêzîkî gundê Konakê, di nav hêzên dewletê û gerilayan de ser derket. 5 leşker hatin kuştin.

Li Dêrsimê, navçeya Mazgirtê li gundê Dilanoğlu, gerilayan xâyneki kuştin.

Li Diyarbekir li navça Çinarê, meleyê gundê Kitinê, ji ali gerilayan ve hat daleqandin.

HAWAR

Dilbixwîn

Pêşmergeyêñ mewsîmî

“... Aman, hawar! Mirîşkan ji me re bişînin. Mirîşkên me ji Sedam tîrsîyan e, hêkan nakin. Em ji we rica dikin, hûn ji me re cend hezar mirîşk bişînin...”

Di dema reva 91’ê de berpirsiyare “pêşmerge” yên Berzanî yê Behdînanê, ev gotinêñ jorîn ji spikerê radyoya Kurdi ya Austuralya re dibêje. Çaxa ku min li hevpeyvînê guhdarî kir yekser gotineke Mamosta Osman Sebîrî hate bîra min: “Bi cend qurûşan malbata Berzanî dikare xwe sed carî bifiroşe.”

Ev ên li Başûr pêşmerge ne, lê paşmerge ne? Eger ku pêşmerge ne, ez dîsa dipirsim, ci cûre pêşmerge ne?

Dema ku Berzanî bêhnê li wan teng dike, boxçeya xwe radikin û direvine cem Telabanî. Dema ku Telabanî erdê li wan teng dike, xwe davêjine hembêza Sedam, li pêşîya megrefon û kamereyan mîna bilbilan pesnê Sedam didin û keviran bi Telabanî û Berzanî wer dikin. Dostaniya Sedam jî dirêj nake, te hew dît ku dîsa di dawa Berzanî de ne. Vê carê ji Berzanî re ayeta Elkursî dixwînin. Maşella, mîna qîlokê digerin.

Gava ku birçî di-
bin tifinga xwe difi-
roşin, gelo tifing ji
tê firotin! Ji bo kirti-
kek nan hezar se-
leqotî didine xwe û
hawar û hawar! Di-
revin. Belê, direvin.
Zarokan, jinan, ka-
lan... Pir û şîrmijan
li pey xwe dihêlin û
direvin. Di bihara
91’ê de hindik reviyan?! Rev ji wan re bûye tor û adetek,
bûye nan û av, bûye zihê (jarî) û ketiye xwîna wan, bi wan
bûye şekir û dimsê Entabê.

Têra dilê xwe reviyan! Ev revê ku heya niha kirine, he-
ya heya besî wan e.

Hinek ji wan revrevakan niha vege riyanê. Împêryalîzmê
çend nan ji wan re hazır kirine, birçî narnînin, ji lew re ve-
geriyan e. Bellî nabe, kî dizane, dibe ku dîsa dawa xwe
têxine devê xwe.

Maşella fire-fir bi rojname û televîzyonê Tirkan ketiye,
ji wan re bûye dawet. Mîna baranê, gulan bi ser paşmer-
geyan de dîbarînin. Wan weke Têmûrleng û İskenderê
Mekdonî didine nîşandan. Dema ku mirov rastiyê nîzânibe,
wê ji derewên wan bawer bike.

Çend kalên rûqermî, diranîketî, lîv behn, poz bilîk, par-
sûyên wan weke parsûyên çelekeke zebûn xuya dikin, li
ser tankên “bavo” siwar dîbin, di ser serê wan re ala Tirkan
pêl dide, ew ji dikenin, weke ku Kurdistan rizgar kiribin.

Ev ci pêşmerge ne?

Xwe di pişt kumê mehmetçikan de vedîşerîn, nişana zaferê hildidin, xwe dîk dikin û dibêjin: “Atatürk bavê me ye, Semra Özal diya me ye, wê şorbenîk da me. Biji Türkiye, bimire PKK.”

Bila mala vê rûreşî û xiyanetê bişewite. Yarê diya xwe
ber nadîn, ma şîqe şîqa keçen bedew di konê Mêrdinê
de nehate guhêne we, dema ku leşkerên Tirk bi wan dîlis-
tin? Ev e, ji bo wê yekê Berzanî dibêje “Bi ji Türkiye”. Ez
rast dibêjim; min bi xwe nameyek dît, tê de li ser riswakiri-
na keçen Kurd bi destê leşkerên Tirkan, di kampê Mêrdinê de, nîvîsibû. Nîvîskarê nameyê bi Kurdi -tipen E-
rebî- wiha dînîvîsîne: “Hawar, hûn li ku ne, van bêbavêne
Tirkan, keçen me rezil kirin, destê xwe avêtin namusa me.
Hawar werin, me ji vê bênamûsiyê xelas bikin...”

Oehlermaniya “pêşmergeyêñ” mewsîmî di vir de diyar
dibe.

Ji kerema xwe re şaş fêm nekin. Ez ji paşmergeyan re
dibêjim, ne ji pêşmergeyan re. Ew paşmergeyêñ ku rojekê
li çiyan in, deh rojan li kêleka jinan in... Şabaş, derpi ji paş-
mergeyan şemiti...

Mirovahî serdestê hertiştî ye

Navenda Nûçeyan— Li Almanya meşek li dijî érişen Neo-Naziyan li qada Wittenberg'a Berlinê, bi besdarbûna Serokkomarê Almanya Weizsaecker, Serokwezir Helmut Kohl, réxistinên demokratik, siyasetvan, hunermend, nûnerên sendika û sazen-deyên endustrî û bi gelek kesen girîng ve di roja 8.11.1992 an de çebû.

Meşa li dijî nijadperestiyê, di binê slogan "Xewna mirovahî serdestî hertiştî ye" de li dara ket û 3000 mirov besdarî vê meşa girîng bûn.

Lê di vê meşa girîng de dîsa Neo-Nazi netebitin û bi kevir û hékan érişî Serokkomarê xwe Weizsaecker kirin. Neo-Nazi

xwestin astengiyan ji peyvîna Se-rokkomar Weizsaecker re derînin.

Li gorî qeydên polisan, ji serê salê û bi vir ve 1800 bûyer ji a-liyê Neo-Naziyan ve hatiye qewimandin. Ev hejmara han, tenê bûyerên ku derbasi qeydên réxistina polîsên Alman bûne ye.

Îro li Almanya ev kes, her di-çin êrişkarî ya xwe ya li dijî biyaniyan zêdetir dikin.

Herwiha partiyen nijadperest ji vala ranawestin ew jî rayen xwe zêde dikin û ji gel jî desteka xwe distînin.

Li welatekî ku dîmena wî wi-ha ye, ev meşa li dijî nijadperes-tiyê şeqameke baş bû ku li rûyen Neo-Naziyan hate xistin.



'Bijî Şoreşa Cotmehê'

Navenda Nûçeyan— Li Rus-yayê li bajarê Moskovê û li hi-nek bajarên din, ji bo salvege-ra Şoreşa Cotmehê ya 75 an mitîng û meşen mezîn çebûn. Lê vê carê ev mitîng û meş, ne li Sovyeta sosyalist, li Rus-yaya kapitalist çebûn. Di bin ala sosyalizmê de bi wêneyên Lenin û Stalin bi deh hezaran kes, karker, gundi, xwendevan besdarê meş û mitîngan bûn.

Ji hilweşandina sistema Sovyetê û vir ve, ev nêzîkî 2 sal derbas dibe. Dijminê sos-yalizmê, zilamê Amerikayê Borîs Yeltsin, bi sloganên delal yên kapitalist hatibû sero-kiya Rusyayê û gel xapandibû. Borîs Yeltsin û kadroyen wî pêşî Partiya Komunist gitin. Şûn de jî xebatên komu-nîstan qedexe kirin. Lê ev 2 salên ku derbas bûn nişan da

ku, ev sistema Yeltsin dixwaze di Rusyayê di cih bigire, ne sistemeke mirovahiyê ye. Îro li Rusyayê ji destpêka sistem û têkiliyên kapitalist ve di civaka Rusan de pîr tişt guherine.

Edî ji fahîşeyan û dizekan kes nikare di kuçeyên Moskovê de derbas bibe. Tu karek nemeya ku mafya dest ne-avetîbe. Standarda jiyana kar-keran roj bi roj dikeve. Enf-lasyon %12 hezar e. Ev tev encamên têkiliyên kapitalist in, ku roj bi roj tesîra xwe li ser gelê Rus zêde dike. Ji ber van nexweşiyen ku li jorê ji hatin zimên, di van mehîn dawî de karkeran li dijî hikû-mata Yeltsin û kapitalizmê meş û mitîngên xwe zêde kiri-bûn. Li aliye din li dijî politi-kayen Yeltsin û kapitalizmê endamên Partiya Komunist ya berê û hinek kes û hêzên sos-yalist, di van 2 salan de 4-par-tiyen komunist damezirandin.

Di salvegera Şoreşa Cotmehê ya 75 an de ev hêzên sosyalist, tevî karker, gundi û xwendevanan ve li Moskovê li Leningradê, li Sibiryayê û li hinek bajarên din di bin alen sosyalizmê de û bi wêneyên Lenin û Stalin li meydan an bûn. Li Moskovê 40 hezar kes bi coşke mezin salvegera Şoreşa Cotmehê piroz kirin. Ü ev şoreşa ku hikûmeta Yelt-sin ya kapitalist, dixwaze were jîbirkirin parastin. Di mitîng Moskovê de besdarên mi-tîngê, dirûşmeyen li dijî Yelt-sin û kapitalizmê avêtin. Ü gotin: "Bijî şoreş, bijî sosyalizm", "Bimre hikûmeta Yelt-sin", "Bijî şoreşa Cotmehê".

Em jî dengê xwe datinin ser dengê wan û dibêjin "Bijî Şoreşa Cotmehê".



Li Almanya sêsed hezar însan li dijî nijadperestiyê meşyan.

GOTİN



Yaşar Kaya

Cendîme

Gundê me, li quntara çiyayê Agirî ye. Çiya dest dane hev. Zozanên me yên Mayor, Pişta Qelê, Dûmo, Şipo giş li van çiyayan rîz bûne û nêzîkî hev in. Bi nêzbûna havînê re, des-ta Rewanê gelek germ dibe. Em jî, derdi-kekin van zozanan, herkes diçû li van zo-zanan bi cih û war dibû. Gund vala dibûn. Niha gelek ji navê van gundan ha-tine guhertin. Gundê ku ez lê bûme, Mûcê ye. Mûcê di rîza İxdîre de ye. Li a-liyê rastê Horgof, li alyê cepê jî, Orşîmis û Dendemurat hene.

Di zarotiya min de, li Horgofê eskeriye hebû. Beriya şerê cihanê yê duyemîn (ez wê demî 7 salî bûm) Bataryaya Top-çi kişandin Erzeromê, careke din jî paş ve nehatin. Eskeriyeke giran hebû li Hor-gofê. Niha navê Horgofê kirine "Su-venen". Gelek kaniyên delal û ava zelal hebû li Horgofê. İxdîr hê jî bi ava Horgofê dijî.

Serê sibeyek zû, cendîme û eskeriye li gundê me Mûcê, girtin ser mala bavê min. Bavê min dewlemed bû. Pez û de-warân wî hebûn, çend heb hespîn me hebûn, cehniyek hebû, ez tim lê siwar di-

bûm, mehîn hebûn. Gelek jî erdê me hebû. Ji wî dewlemedtir kes tunebû.

Sibe bû me taştê dixwar. Cendîme der û dora mala me girtin. Hinek ji wan ketin nava malê. Serbazê van cendîme-yan Seîd Beg bû. Min di wê demê de ni-zanibû rutbe ci ye. Lê ya 'yûzbaşî' bû, ya jî 'binbaşî'. Ez zarok bûm û ji tîrsa digiri-yam.

Qirmeya (şesagir) bavê min, di sindo-qa dayika min de bû. Diya min, rind bi Tirkî dizanibû. Bi xwe ji xelkê Bazidê bû. Gazî min kir, got: "Lawo, tu çima digiri?

Carna sê-çar heb cendîme bi hev re dihatin gundê me, li xortan digeriyan, ew xorten ku neçûne eskeriye, ji wan re di-gotin 'qaçax'. Xort ji gund derdiketin û diçûn xwe li şkeftan vedîşartin. Dema ku cendîme ji gund derdiketin, xort ji şkeftan derdiketin û di-hatin nava gund û diçûne malen xwe. Bavê min sond dixwar, digot: "Lawo, çi-qas mal û milkê min heye, ezê bifroşim, ji bo xwendîna we." Me du bira xwend. Yê ji me biçuktir, Herbiye xelas kir û bû 'teğmen'. Sala li İxdîrê zelzele çebû, ew jî, li 'Sarıqamîş' serbaz bû. Bi lez diçe gundê me, xuşkîn me yên li gund in, wî dibine nav gund. Wê rojê jî, cendîme di-sa li gund in, hatine ku mirovan bigirin û bivin û bikutin. Xeber didine birayê min, ew jî derdikeve pêşîya cendîmeyan, ji wan pirs dike, dinêre ku cendîme ji bo neheqiyê hatine. Yek ji wan dikute, yên din jî berî wan dide û cendîme diçin. Gundî digotin: "Lawo, Xwedê te şand, ev hatibûn, wê me dîsa perîşan bikiran."

Were vir, ezê kanfertan bidime te (kan-fert=şekirê di nav kaxizan de). Bi vê go-tin re, xwe ber bi sindoqê ve kişand, ez çûme cem, sindoqê vekir û pêşa xwe ve-kir, qirmeya bavê min xiste nav kemera xwe. Cendîme mala me serûbin kirin, lê

tu tişt nedîtin. Torbeyek hine hildan. Ev hine ji bo serê dayika min bû û taximê ku bavêmin pê xwe traş dikir û ji xwe re ji Stenbolê anîbû hildan û lêxistin cûn. Bavê min jî dan "Dîwan-î Herb"ê. Di wê demê de, ev navê dagdîha leşkerîye bû. Dawî bavê min cû, li dadgîhî ıspat kir ku ew taxim û hine ne malê tu kesî ne, wî ji xwe re ji Stenbolê standiye û berat bû.

Jî wê rojê û vir ve, min tu caran cen-dîmeyan ji bîr nekir. Carna sê-çar heb cendîme bi hev re dihatin gundê me, li xortan digeriyan, ew xorten ku neçûne eskeriye, ji wan re digotin 'qaçax'. Xort ji gund derdiketin û diçûn xwe li şkeftan vedîşartin. Dema ku cendîme ji gund derdiketin, xort ji şkeftan derdiketin û di-hatin nava gund û diçûne malen xwe. Bavê min sond dixwar, digot: "Lawo, çi-qas mal û milkê min heye, ezê bifroşim, ji bo xwendîna we." Me du bira xwend. Yê ji me biçuktir, Herbiye xelas kir û bû 'teğmen'. Sala li İxdîrê zelzele çebû, ew jî, li 'Sarıqamîş' serbaz bû. Bi lez diçe gundê me, xuşkîn me yên li gund in, wî dibine nav gund. Wê rojê jî, cendîme di-sa li gund in, hatine ku mirovan bigirin û bivin û bikutin. Xeber didine birayê min, ew jî derdikeve pêşîya cendîmeyan, ji wan pirs dike, dinêre ku cendîme ji bo neheqiyê hatine. Yek ji wan dikute, yên din jî berî wan dide û cendîme diçin. Gundî digotin: "Lawo, Xwedê te şand, ev hatibûn, wê me dîsa perîşan bikiran."

Di nav gelê me de, giliyek xweş heye, dibêjin: "Gundê bê xwedî, bi roj talan di-kin."

TC, Îran û Suriye

Dewleta Tirk, ji bo şerê li dijî Kurdan dimeşine, li dû alikariya dewletên Ereb û Îranê digere û dixwaze yekitiyek di nav xwe û van dewletan de çêbike.

Serokwezirê dewleta Tirk Süleyman Demirel, ji bo pêkhatina vê armancê geştek li Pakistan û Îranê li dar xistibû. Li gor hin agahian; ji bo yekitiyek wiha, bi Sedam re jî, hin danustandin çebûne. Ji dewletên ku heta niha ev teklîf li wan hatiye kirin, ji Siûdî Erebistan pê ve hemû deng didin yekitiyek wiha. Siûdî Erebistan heta niha ji bo yekitiyê tu tişt negoziye. Hemû dewletên ku Kurdistanê dagir kirine, Kurdan li Rojhilata Navîn weke talûkeyek dinirxînin. Di nav van dewletan de, dijberiyen girîng hene. Hemû bi tirseke mezin destekên xwe digihînin hevûdin û her cara ku têkoşîna Kurd bi pêş dikeve, di nav van dewletan de, avakirina yekitiyek tê rojevê.

Greva birçîbûnê dom dike

Greva birçîbûnê li zîndana Elezîzê gîhişte 45 rojan. Rewşa siheta girtiyan çiqas diçe xerab dibe.


Li Navenda Komela Mafê Mirovan jî, greva birçîbûnê ya ku ji hêla malbatê 9 kesên li

qereqolan windabûbûn, dest pê hatibû kirin, gîhişte 10 rojiya xwe.

Li Özgür-Der jî 15 kesên din ji bo piştgiriya van malbatan, ketin greva birçîbûnê.

Wekî din girtiyen zîndana Sağmalcılar jî, ji bo protestokirina operasyonê ku artêşa Tirk li başûrê Kurdistanê didomîne û ji bo piştgiriya greva zîndana Elezîzê dest bi greva birçîbûnê kirin.

Li aliye din, li zîndana Çankırı, midûrê zîndanê Celadet Özel gardiyan û leşkeran dişeyne bi ser girtiyan ve. Di van êrişan de du girtiyen bi navê xwe Alişan Turan û Maşuk Sami birîndar dabin.



Girîgeha Diyarbekirê jî bi dehan şoreşger û welatparêzen Kurd daqurtandibû.

Qereqol mirovan dadiqurtînin

Navenda Nûçeyan- İro li Tirkîyê û li Kurdistanê tu ewlekariya jiyana mirovan nemaye. Roj nîn e ku mirovek ji hêla hêzên dewletê ve neyên kuştin. Roj nîn e ku di rojnameyan de li ser windabûna kesan a di bin çav de, nûçe dernekevin. Roj nîn e ku, mirovên destvala ji hêla "hêzên tarî" ve navrojê an ji êvaran neyên gulebarankirin.

Jixwe mafê mirovan iro ne li Kurdistanê maye û ne jî li Tirkîyê. Li Kurdistanê dewleta Tirk şerek gemar û kirêt li hember gelê Kurd dimeşine û êrisen bê perwa dibe ser kesen sivil. Dewleta mêtîngîkar qet qaïden ser ên navneteweyî li hember gerîla pêk nayne, ne heta ku li hember gelê Kurd bîne.

Li Tirkîyê jî êdi infazên bêdarazî (bêmehkemekirin) kuştinê di binê çav de û windabûnen di bin çavan de ji gelê Tirkîyê re normal tê. Lewre ev çespinên dewletê, her diçin zêde dîbin. Bili mal-

batêni kesen di bin çav de windayî û kuşti, deng ji tu kesi dernakeve. Ku ev çend rêxistinê demokratik ji nîn bûna, rewş dê pirr kambax bûya.

Di van rojên dawî de jî, hejmara kesen di bin çav de winda û kuşti, zêde bûn. Kesen ku heta iro tu hay û agahêk ji wan nehatiye stendin ên ku me karibû navên wan tespît bikin, ev in: Yusuf Erişti: 9 Adar 1991 (Hate girtin, di bin çav de winda bû)

Hüseyin Toraman: 23 Cotmeh 1991 (Ji hêla polisan ve hate revandin, di bin çav de winda bû.)

Hüsamettin Yaman: 4 Gulân 1992 (Di bin çav de winda ye.)

Soner Güllü: 4 Gulân 1992 (Di bin çav de winda ye.)

Hasan Güllü: 20 Tirmeh 1992 (Windâ ye)

Ayhan Efeoğlu: 6 Cotmeh 1992 (Ji malê, ji aliye polisan ve tê girtin, winda ye)

Tuğrul Özbek: 9 Cotmeh 1992 (Ji malê, ji hêla polisan

ve tê girtin, winda ye.)

20 Cotmeh 1992 Serokê Partiya Keda Gel (HEP) a Mêrdinê Şehmus Çağra; der barê wi de tu agah nîn e.

30 Cotmeh 1992 Şehmus Aydin ji gundê Bakustan, girêdayî navçeya Stewrê ya Mêrdinê, ji hêla hêzên dewletê ve tê girtin, tu hay û agah der barê wî de nîn e.

Li bajare Qersê, navçeya Mêrdinikê (Göle) Erkan Ersoy, Nûçevanê rojnameya Özgür Gündemê yê Qersê Birkan Çelik, aqûbeta wî ji nayê za-nîn.

Mirov bi hêsanî dikarê vê listeyê zêde bike. Lî bi ya me ev liste bi xwe jî, rewşa dewleta Tirk dide xuyan ku çiqas demokrasî lê heye.

Mirov di bin çav de, bi lêdan û işkencayan tê kuştin. Lî ji bo kuştina wan hincet (bahane) hazir e. "Piyê wî şemîti mir." "Qiriza qelp derbas kir", "Ji ser kursî ket, serê xwe li tiştek hişk xist" û hwd.

Lî kesen ku diçin deynê

xwe ji polis û cendirmeyen Tirk dixwazin û ji hêla wan ve tê kuştin re dê ci bibêjin?

Minak li Bismil, Birol Savaş deynê xwe ji "uzman çavuşek" Tirk dixwaze, lê ji hêla wî ve tê kuştin.

Malbatê ew heft kesen ku tu hay ji wan nîn e hewldanê xwe ya ji bo hînbûna aqûbeta wan, zêde dikin. Serî li hemû meqamên Komara Tirk didin. Herî dawî ji Serokwezirê Tirk Süleyman Demirel ziyaret kirin. Aqûbeta zarokên xwe jê pîrsin. Lî tu tiştekî girîng bi dest nexistin. Lewre bersiva Demirel wiha bû. "Zarokên we di berîka min de nîn e ku ez bidime we."

Lî ev kesen ku "di bin çav de winda" dibin, di berîka Demirel ên "şefaf" de winda dibin. Ne di berîka li ser wî.

Ev rewş, tengasi û rizibûna dewleta Tirk dide xuyan. Dewleta "Serî pûc e binî pûc e" tenê dikare bi darê zorê jiyana xwe bidomîne. Lî ta kîngê dê bikaribe xwe bi vî rengî bijine?

kuştin û windakirin jî, di raporê de bi girîngî cihê xwe girtine.

Rêxistina Efûyê, li ser hîzbî kontrayan ji wiha dibêje: "Di van 12 mehîn dawî de, şiklê kuştinañ guherî. Ji 100'î zêdetir Kurd, yên rojnamevan, politîk-vanen herêmi, endamên PKG (HEP)ê û yên din, bi awayen tarî hatine kuştin. Li gor tê gotin ev kuştin, ji alî rêxistineke ku navê wê Hîzbullah e têne kirin. Lî ev kesen ku hatine kuştin hemû, berê bûne hedefen polisan, hatine girtin û li wan işkence hatiye kirin. Delîlên ku dicivin, nişan di-din ku, hêzên dewletê bi hindikahî, çav ji van cînayetan re digirin, an jî rê nişanî vê hêzê didin û alikariya wan dikin."


Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî:

'TC mesûlê cînayetan e'

Navenda Nûçeyan- Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî, der heqê îhlalkirina mafê mirovan yê li Tirkîyê de, raporek weşand. Rêxistina Efûyê, kirinê TC yên di van demen dawî de, şirove dike û hikûmeta Tirk di van bû-yeran de berpirsiyar digire.

Rêxistin, li ser sozên hikûmeta koalisyonê radiwes-te û wiha dibêje: "Hikûme-ta nû, dema hate ser kar, bi taybetî li ser işkencê rawesiyya. Lî ev hikûmet jî, weke yên din, di vî warî de, tu tişt nekir."

Di rapora rêxistinê de, bi giranî li ser işkencê tê râwestin û mînakên girîng



Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî: "Hikûme-ta nû, dema hate ser kar, bi taybetî li ser işkencê rawesiyya. Lî ev hikûmet jî, weke yên din, di vî warî de, tu tişt nekir."

Ger dewleta me hebe memûrên me wê çawa bin?

Borzoo S.D.

Di sala 1979 an de piştî hil-
weşandina rejîma Şahê
Îranê, ez ji wek sedan mi-
rovê. Îranî û Kurdistanî cû-
me welêt.

Welatparêzên Kurd diza-
nin ku dijminen me rojhilatê
Kurdistanê kiriye çar beşan.
Beşek ji beşen Kurdistanê re-
dibêjin Azerbaycana rojhilat.
Ez ji bajarekî vî beşî têm.
Dema ku ez çûm bajarê
xwe, min dît ku di destê
hemû Kurdêne de çek he-
ne. Rojên pêşin li dora me
civîyan û gotinê nebaş û
hêrsa xwe li diji Tirkê Azerî
digotin. Me sebeb ji wan
pirsi, ewan got: "Ferqê dixin
navbera me; tiştan nafiroşin
me." Vê derê gerek bêgotin
ku pirraniya mirovê bajêr
(bajarvan) Tirkê Azerî ne, lê
derdora bajêr Kurd in. Me
dît ku Kurdêne de dixwazin
bi zora çekan heyfa (întîqa-
ma) xwe ya çend deh salêñ
pêşin ji, ji wan bistînin. Me
ji wan re got, kuştin ne baş
e. Em giş birayê hev in. Ne-
zan û dijmin dixwazin nav-
bera me xerabikin.

Em di vê demê de ditirsi-
yan ku Şah careke din vege-
re Îranê. Me bi merkeza
Kurdistan, bajarê Mehabad
re peywendi girt. Wan ji me
re got SAVAK (MIT a
Îranê) dixwaze gelên Îranê
berde canê hev û nerehetiyê
çêke. Ger Azerî we biêşinîn
ji hûn tişteki nekin. Ev bir û
baweriya ji aliyê mamosta
Şêx İzedînê Huseynî ve ji di-
hat gotin. Di hemû Îranê de
herc û merc (anarşî) bû.
Xelkê hesabêñ kevn ji hevû-
din distandin. Rojê sedan
kes bi destê hev dihatin
kuştin. Me çend xwendê-
karêñ Kurd zû civînek çekir
û biryar girt, ku em ji bo
kontrolkirina Kurdân di-
navê de, divê em zû komî-
teyekê ji bo kar û barê wan
di bajêr de vekin. Me bîna-
yen (avahiyek) ji bo xwe
girt. Milet li dor me kom
bû. Eşîrên Celaliyan bûne
yen. Wisa dizanibûn ku me
serxwebûna xwe vergirtiye.

Yek car bi şahî û carna ji bi
xemî hêşir ji çavêñ me diha-
tin. Me dizanî ku ev azadî
pirr dom nake. Lê gelê me
yêñ vir bi çavêñ dewletê lê
mêze dikirin. Mesele zor
(pirr) dirêj e. Ez dixwazim
di vê demê de tiştêkî ji we re
bêjim ku tu cara ji bîra min
naçe.

Mirovêkî me hebû, ew kal
û ixtiyar bû. Di dema Ko-
mara Mehabadê de cen-
dirmê komarê bû. Ev ka-
lemêr du kurê wî yêñ hêja
hebûn û niha ji hene. Berî
ketina Şah, Tirkê Azerî
pezên xwe ji bo derbaskirina
zivistanê tîne cem wî, heya
ku bihar bi ser de were. Ro-
jekê pez li ciyê birr dibe û
gur çend pezên wî Tirkî ji
dixwin. Tirkê Azerî piştî de-
mekê tê serî li pezên xwe bi-
de. Jê re dibêjin ku guran
çend pezên te xwarine. Ev
bawer nake. Dibêje na, we
pezên min dizîne. Yê Azerî
diçe cem cendirmê Şah, ku
ew ji Azerî ne gili (şikayet)
dike.

Cendirme têne gundê wî
kalemêri, wî bi du kurê wî
ve digirin geleki li wan dixin
û işkence diken. Cendirmê
dijmin bedêla pezên guran
xwarî çend pezên wî Kurdi
jê distînin û didin Tirkê Azerî.
Yê Azerî pezên xwe
kom dike û dibe mala xwe
(ew ji gundekî dûr e). Şewata
lêdanê û şewata pezên wî
ku bi neheqî jê standine di
dilê wî de dimîne. Ji tirsa re-
jîma Şah ji nikare tişteki bi-
ke. Dema hatina Xûmêni û
reva Şah tê. Leşkerêni Şah di
pirr cihan de çekêñ xwe di-
dine millet (gel) û direvin.
Herc û merc dest pê dike.
Hesabêñ kevn derdi Kevin
meydanê. Azerî zor ji Kur-
dan ditirsin. Her du kurê wî
kalemêri tivingêñ xwe digiri-
ne destê xwe û diçin ji bo
hesabêñ kevin.

Tirkê Azerî digirin, têra
wî lêdidin û pezên wî giştî ji
xwe re tînin. Di navê de bû
deng kû Kurd Azeriyan talan
diken. Me ji ev tişt bilîstîn,
lê me nizanibû mesele ci ye.
Yê Azerî hate cem me şika-


yet (gili) kir, ku filan kesî ez
talani kirime. Me ji bo xatirê
doza Kurdî ku nebêjin ew
cerdevan in du pêşmerge li
jîbekê siwar kir û şandin cem
apê kalemêr. Her du
pêşmergeyêñ me diçin mala
apo, wî maç diken, jê re
dibêjin apo te dîsa ci kiriye?
Dema ku apê kalemêr
pêşmergeyêñ Kurd dibîne
pêş de erdê (axê) maç dike,
paşê ji bi çavêñ tijî hêşir her

du pêşmergeyan hemêz di-
ke. Ji wan re dibêje kurên
min xwesteka dilê min ev bû
ku ez careke din pêşmer-
geyên Kurdistanê bibinim.
Ez malê xwe, canê xwe û
lawêñ xwe dikim qurbana
we. Hûn ci dibêjin, hûn di-
zanan. Pêşmergeyêñ delal ji
pezên Azerî yêñ ku cendir-
meyen Şah bi neheqî jê stan-
dibûn didin apo û yêñ din
(mayî) ji didin ê Azerî. Tirkê

Azerî dibêje:

"Allah bereket versin" û
razî diçê.

Min dixwest ji vê bûyera
rast (heqiqî) ku yek ji heza-
ran başî û xweşiyê nete-
weyê serbixwe ne, bidim
xuyakirin ku ger em xwedî
dewlet bin, dîtina mirovê
me yêñ xwedî erk (wezîfe) û
gelê me, yêñ di gel hev çawa
be. Azadî û rizgariya gelê
me, wê çigas şîrîn be.



Siwarekî Kurd li gundekî Rewanê.



Dema ez mirim, li rēça (dewsa)
min negerin; ji ber ku ez bayê
azadiyê me.

Ernesto Che Guevara

Çima tu nabî 'Beranê Bisko û di nav pezê bavo de namînî'

Çend roj berê ji qulika derî re posteya min hat, ez ber bi deriyê eywanê (salonê) ve çûm, posta ku hatibû min girt û lê mèze kir. Posta ku hatibû çend heb zerf bûn. Ji van zerfan yek jê rojnameya Armanc bû. Min zerf vekir rojnameya Armanc jê derxist, hejmara sed û sîh û yek (131) bû. Bi mereq min rûpelê wê vedan, çavê min bi nivisa Riza Polat ket, sernivisa wî "Eger beranê bisko ba, wê li nav pezê bavo ba". Ev nivis li ser sê ronakbirêne Tirk hatibû nivisandin Xwendevanê eziz wek hûn jî pê dizanin, ji van ronakbiran yek di rojnameya Özgür Gündemê de her roj nivisan dînivise, yên din jî di rojnameya Yeni Ülke de nivisan dînivise, herdu ronakbir jî piştgiriya Kurd û Kurdistanê dîkin.

Xwendevanê hêja, dema ku min ev nivis xwend, ez gelek pê qehîrim. Riza Polat, ji berpirsiyare rîxistinê yek jî wan bû. Bo, ku wexteki min jî baweriya xwe bi vê rîxistinê anîbû. Min di nav vê rîxistinê de kar kir û birîndar bûm û niha jî li ser sandaliya bi tekerlek rûniştîme. Pişti dozdehî ilonê ya "cûnta faşist, wan welat terk kir, derketin Suriyê. Pişti çend sal jî, hêdî hêdî rîxistin belav kirin. Xeynî sê-çar endamên komîta merkezi, kes ne ma û jî xwe re dibêjin "em parti ne". Yanî pêşengiya karkeran-dîkirin. Min mèze kir rîxistin meşandin karê vana nîn e, min dev jî rîxistinê ber da. Lewma ez zaf pê qehîrim û mecbûr mam ku ev nivis binivisinim.

Riza Polat! Rexnegirtina te ne ciddî ye. Eger rîxistina te di şûna PKK de wilo xurt bûya û Haluk

Gerger jî di rojnameya rîxistina we de nivis binivisanda, ez bawer nakim ku te rexne lê bigirtana. Lewre ev zîhniyet, zîhniyet rîzgariya welat nîn e, zîhniyet, zîhniyet eşiratî ye. Eger zîhniyet rîzgariya welat bûna, te rexne li Haluk Gerger nedigirt. Kurd jî û Tirk jî pê dizanin ku Haluk Gerger û Yalçın Küçük Tirk in. Lî i-ro di Kurdistanê de şerekî çekdîri heye, hindik be jî ev herdu ronakbir, li diji dewleta faşist di rojnameyê Kurdish de nivisan di-nivisinin.

Riza Polat, te xwe bir kiye ku, heta doh rîxistina we li dû Partiya Komunista Tirk (TKP) û hin çepê Tirk digeriya, bo ku rîxistina we nas bikin û piştgiriya we bikin. Ci ji destê we dihat we dikir. Dinya hemû pê dizane ku, TKP berê jî hebûna Kurdistanê qebûl nedikir û iro jî nake. Dema ku rîxistina we "Sol Birlik" çekir. (programa Sol Birlik rezaletek bû) wê çaxê te rexne li çepê Tirkan nedigirt. Nav rîxistinê de dema ku hin heval li diji "Sol Birlik" derdiketin, digotin "Wek rîxistin gere em berê di gel çepê Kurdish cephe çekin. Dû re li gel çepê Tirk re."

Riza Polat û pirraniya hevalê xwe li dij derdiket. Digot "Bi çekirina Sol Birlik" ê wê dinya rîxistina me nas bike, ev ji bo rîxistina me baş e."

Riza Polat, tu berpirsiyare rîxistineke karker bûyi û rîxistina te pêşengiya karkeran dikir û baweriya rîxistina te ya bi marksîzmê jî hebû. Çawa ku serokê Yekîtiya Sovyet û Gorbaçov derket holê, xwest ku reformê li diji marksîzmê pêk bine, te û serokê xwe, we çepik ji Gorbaçov re lê

dixist û baweriya te ya sosyalizmê nema û heta tu dijiti jî dikî. De qurban ev ci ye, êdî tu behsa internasionalizmê dikî. Bavê diya xwe, ev dozdehî ilonê, hûn berpirsiyare rîxistinê, hemû reviyan derveyê welat. We hemû dost û hevalen xwe yên rîxistinê, ewen ku di zindanan de bûn, ewen ku li derive bûn, we di cih de hiştin û reviyan Suriyê. Hûn rojekê xwedi li dost hevalen xwe derneketin. We tola şehîd rîxistina xwe û yên Kurdistanê di cih de hişt. Hûn bi wê jî neman, we hemû qadroyê rîxistina xwe, tek tek kişandin kuçe û kolanê Ewropa. Hûn bi wê jî nesekinîn, ji rehetiyê û békâriyê, we ji hev û du xuy (kîcik almak) kir û we rîxistina xwe belav kir, li sûka Stockholmê hûn digerin û kîfa xwe dikan.

De lawo, qurban Riza, PKK vegeriya-welat, ev heş sal in ku, şerî çekdîri dide û bi hezaran şehîd xwe ve di nav gelê xwe de ye. Doza Kurdistanê dimeşine û tola hemû şehîdên Kurdistanê digire.

Tu û rîxistina xwe jî biçin Welat de şer bikin, wê çaxê ewe hin ronakbir piştgiriya rîxistina te jî bikin. Kesi bi we negirtiye, yê ku bixwaze şer bike Kurdistan bo wî hemêza xwe vekiriye. Lî tu û rîxistina xwe, ci dîkin?

We "Sol Birlik" a xwe jî bîr kirîye, we gazi "SODEP" ê jî dikir, bo cephâ diji faşizmê.

Bavê kalê xwe, wa ye li welatê me xwin laşan dibe, ki piştgiriya me bike qey xirab e?

Riza qurban, çima tu nabî "beranê bisko û li nav pezê bavo naminî." Tu ji xelkê re dibêji.

Mihem Himbelij

Îmam xwe şas kir polîs ew kaş kir

Li Tirkîyê carna bûyeren wilo di-qewimin ku, bi rastî mirov, di şî-rovekirina van bûyeran de, şas û mat dimîne.

Dewlet bi xwe, nav li xwe kîriye laîk. Lî di nav kadroyen dewletê de, qala laîsizmê jî, weke gunehêk mezin e. Lewre ev çendik û çend sal in ku, bi poili-kayênen dewletê yê durû, kevneperesten olperest, di hemû daîreyen dewletê de, cihêñ herî bilind û gîring bi dest xistine. Ji ber ku dewlet, van kevneperestan, weke taqozê dihesibine û li hember pêşveçünêne pêşverû dide pêş. Ev herdu alî jî, li gor he-

sabén xwe, hevûdin dixapinîn û ji bo pêkanîna armancen xwe bi kar tînîn.

Yek jî saziyên dewletê, yê ku di bin hikmê kevneperestan de ye jî, emniyet e. Olperest di nav polisan de, gelek bi rîxistin in. Ev-bûyera li jér jî, têkiliyên polisan bi dîn re, bi awayekî balkêş ekere dike.

Li Çanakkalê (ku bajarekî Tirkîyê ye û li bakurê rojava ye) imamek, nîvê şevê jî nişkav ve ji xewa xwe ya şîrin şiyar dibe, li saeta xwe dinêre û bi lez ji paşa pîreka xwe derdikeve û berê xwe dide camiyê. Weke her car azana

xwe dixwine, limêja xwe dike û bi dîlxweşîya ku peywira (wezîfa) xwe pêk anîye, ji nû ve berê xwe dide paşa pîreka xwe.

Îmam reben, ji nû ve, lê ica bi gurme gurma derî şiyar dibe. Dibêje "Xwedê xér ke" û derî li van mîvanen nîvê şevê vedike û bi carekê polis wî zeft dikin. Îmam hê bi meselê nizane, lê pişti ku wî dîbin qereqolê û çend sile lêdidin, fêm dike ku, di şûna pênc û nîvan de, li yek û nîvê şevê azan xwendîye. Bi vî awayî ji, polis bi îmam didin fêmkirin ku, di dînê İslâmê de, efûkirina xeletiyen bi vî rengi nîn e.

TİR

Musa Anter



Xal Musa, to ganî remayışê dizdan bidînî

(ZAZAKİ)

Ma şarê teberî herçî xeberan verrenêdanî. Ma hergû roj xêlê wextê xwi danî xeberan. Çimey xeberanê ma, çend rojname û kovarı, çend radyo û televizyonî û ge ge zî telefon û faks û. Helbet xeberî tewir bi tewir û. Xeberî estî çaxo ki, kê goştarenî pelê kê bibî, kê a hing di keyfan ver o fireni. Xeberê anasareni moral danî kê, bawerey kê xurt kenî, şewqê xebati vêşî kenî û kê xebati ro sur benî. Labelê kêt tim û tim xeberanê weşan nîşnawenî. Xeberî estî ki, kê cadi wişk û wa'd kenî. Xeberî estî ki quesbarey kêt daxnenî û hewnê şewan kêt rî heremnenî. Ci heyf ki nê zî xeberî û ma yînî zî eşnawenî. Nê xeberan ra ya tewr nîweşi zî, xeberî kîşiyayışê Xal Musa Anter bî.

Televîzyoney Tîrkan kîşiyayışê Xal Musay heze yew xebera bol normal va. Reaksiyonî mino veren; mi xwi var di rojnamey Welatî akerd û Xal Musay geyrewo. Xal Musa quçıkda xwi di bi. Hezey veren peymiriyawnî. Tîr di namay nuştada cê Aqil û Mantiq o. Xal Musa na nuştada xwi di behsê deluyey (xintey) dewleti keno. Xal Musa neheq niyo helbet. La eke dewleti zir delu nîba Xal Musay kişena!

Kê zaf xeberanê televîzyon û radyoyanê Tîrkan bawer nîkenî. Aw semed ra ez yew embazi rî telefon a-keno û ez wazeno bizano gelo na xeberi zur a ya rast a. Embazo ki ez derî telefon akeno, nê aşmandê peynan di, çend aşmî keydê Xal Musay di mendbi. Embaz vano: "Dewleta Tîrkan, Xal Musa kîsto." Ez hinî mecbur maneno merdişê Xal Musay qebul biko.

Mi namey Musa Anterî xorteyda xwi di eşnawitibi. Qimil, Birîna Reş û Musa Anter tê reyra telafûz bînî. 1987 ra pey, yew yew nuştâ û roportajê cê rojnama û kovaran di vecaynî. Labelê mi hetanî XATIRAY cê nîwendibî, derheqdê cê di yew zanayışê mino vêşî cinê bi. Bi Xatiran mi yo newe re keşf kerd. Xatiranê cê mi ser o gelek tesîr kerd. Eke kêt raşt vacî, mi heyanî ay wextan nîzanaynî no emir di, yew mîrdimê ehen-dey jîhat û zanaye ma miyan di esto. Mi a gam ra pey Xal Musay ra hes kerd. Ez mutewaziyyet û canmîrdey Xal Musay, ez roşenbîrey û bawerey cê, nê Xatiran ra bander biya (musaya). Mi nê Xatiran di dî ki, Xal Musa çendeyî qedr û qîmet dano ziwan û millatda xwi. Mi nê Xatiran di dî ki, Xal Musay semedê welat û milletey xwi ci ezet û sefley diya. Mi nê Xatiran di, xoriyey roşenbîrey Xal Musay dî. Ü mi nê Xatiran di dî ki, Xal Musa roşanbîre çaxê xwi no.

Wexto ki Yeni Ülke û ti ra pey Welatî dest bi weşanê xwi kerd, Xal Musa hinî hergû hewte mîmanê ma bi. Roj û roj hezey gelek wendozan, ez biya tîryakî cê. Bi rojname Özgür Gündemî Xal Musa hina vêşî nîzdî ma bi. Mi hema hema hergû roj Xal Musa wendînî.

J. Espar
(domahîk esto)

Polîtikayêñ kevin iflas kîrin. TC polîtîka diguhere.

'Li her derê û bi her awayî şer'

Navenda Nûçeyan- Dewlet, li Kurdistanê û li Tirkîyê li hember têkoşina Kurd, li gor bermameya xwe ya nû "li her derê û bi her awayî şer" (topyekun savaş), dest bi şerekî dorfirê û gemaritir kiriye. Ev şer, xwe di van bûyeren dawî de eşkere kiriye. Hikûmeta koalisyonê, weke hikûmeta şerê taybetî kar dike û bi her awayî di bin fermana leşkeran de ye. İro li Kurdistanê qirkirinek bi giştî tê meşandin. Gund, navçe û bajaren Kurdistanê têne hilweşandin. Lî ji tu derê û bi tu awayî deng dernayê. Berpisîyarên şerê psîkolojîki kontrolê xistine destê xwe. Çapemenî, bûyeran nanivîsine, rêvebirên dewletê ji bo xapandina raya giştî û dînyayê listikan li dar dixin û meydan ji leşkeran re maye.


MGK Û ŞERÊ PSÎKOLOJİK

Saziya Ewlekariya Neteweyî (MGK), bi metodên Amerîka li Kurdistanê û Tirkîyê, ji bo tunekirina serhildana Kurd, li aliye bi her celebi kuştin û windakirina mirovîn welatparêz didomîne, li aliye bi hilweşandina gund, navçe û bajaren Kurdistanê qirkirinek bi giştî dimeşîne û li aliye jî, bi şerê psîkolojîk dixwaze xwe heqdar nişan bide û kîrinêñ xwe veşere. Yek ji armancê şerê psîkolojîk jî, demaralizekirina gel û ji têkoşînê dûr-xistina xelkê ye.


İro di politikaya MGK'ê yê şerê psîkolojîk de, hin tiştîn nû xuya dibin. Heta niha, di meşandina şerê psîkolojîk de, bingehêke teorîk nîn bû. Dewlet vî şerî bi dizi û ji bo veşartina kîrinêñ xwe bi kar dihanî. Piştî ku ev şer eşkere bû û kete rojeva raya giştî, diviyabû ku jê re bingehêk bê avakirin. MGK bi xwe ev kar da ser milêñ xwe û li gor bermameya xwe, di vî warî de, dest bi xebatê kir. Pêkanîna yekemin, amadekirina pirtûkeke bû. Ev pirtûk niha tê amadekirin. Li gor beyanê wan, dê di pirtûkê de, bi wêne û nivîs, bûyeren hin deveran, weke ku PKK'ê kiribe bêne nişandan û PKK bê tewandarkirin. Ev pirtûk, dê bê pere were belavkirin. Xuya ye ku, wê ev pirtûk bi darê zorê di nav kar ker û karmendêñ dewletê de, bête belavkirin. Li aliye din, ji bo welatêñ Ewrûpa jî, bernameyek hatîye amadekirin. Li gor vê bernameyê, dê ji bo televîzyonê Ewrûpa program werin amadekirin û bi pere û van televîzyonan bêne weşandin. Naveroka van filîman jî, dê her wek yê pirtûkê bin. Dewlet, niha bi televîzyona Alman "SAT 1" re di bazariyê de ye. Xuya ye, dewlet ji bo vî



MGK polîtikayêñ nû tesbît dike.



Leşker, polîs û kontrgerîla van polîtikayan diceribîne.



Gelê Kurdistanê polîtikayêñ nijadperest berteref dike.

karî butçeyek mezin vejetandîye. Lewre di televîzyonê Ewrûpa de, weşandina programên wiha bi pereyekî mezin pêk tê.

Di van amadekariyan de, tişteki balkêş derdikeye holê. Ev pirtûk û filîman ne ji alî zanîngî, akademî an ji zanyaran ve, lê raste rast ji alî MGK'ê ve têne amadekirin. Lewre, armâna amadekirina vân pirtûk û filîman, xapandina raya giştî û dînyayê ye, pisporêñ vî karî jî, di nav MGK'ê de ne û ev kes, ji mektebêñ şerê taybetî yên li Amerîka derketine.

Televîzyona ku bi taybetî, ji Kurdistanê re weşanê dike, bi navê xwe "GAP" jî di xizmeta MGK'ê de ye. Di vê qenala televîzyonê de, bi taybetî propagandaya dewletê û hêzên wê tête kîrin. Li dijî PKK'ê û gerîlayan, nûçeyen ne rast têne weşandin. Ji bo bêtësîkirina gel, filîmîn bê bingeh û vala têne bijartin. Ü GAP, weke navendeke asîmlasyonê tê bikaranîn.

TEWRA ÇAPEMENİYÊ

Çapemeniya Tirk, di vî şerê psîkolojîk de, alîkarê dewletê yê herî mezin e. Di nav rûpelîn rojnameyan de, nûçeyek rast nayê dîtin. Hemû nûçê bi tandansa MGK'ê têne amadekirin û li dijî daxwaziya MGK'ê tu tişt nayê

nivîsin.

Nûçeyen wan, mîna belavokêñ MGK'ê ne, mîna ku navenda nûçeyen wan, di avahiyê MİT'ê de bin. Bi rastî jî, têkiliyek xurt di nav wan û MİT'ê de heye.

Nivîskarîn qorziyêñ (quncikan) van rojnameyan, ideo-logên dewletê ne. Dewlet, di hemû kîrinêñ xwe de, pêşî fikra van nivîskarîn(!) distîne. Dû re, dema dewlet bi hovîtiyek mezin bi ser gel de diçê û qirkinan pêk tîne, paqijiya ve gemarê jî, dibe karê van nivîskar û rojnameyan. Bi awayekî din, mirov dikare bibêje ku, ev mirovîn rûrê, mîna mişkîn di lexeman de, xwe bi pîsîtiyan xwedî dîkin, ew bi vê peywira (wezîfa) xwe, valahiyek girîng(!) dadigirin.

PAQÎJIYA HUNDIR

Dewlet weke ku di şerê başûre Kurdistanê de, li hember gerîlayan, serfirâziyek mezin bi dest xistibe, dest bi propaganda û Paqijiya hundir kir. Li gor dewletê, li Başûr pişta gerîla hatîbû şikestîn, ica dora gerîlayen Bakur bû. Dawî sedemê vê propagandayê eşkere bû. Hêzên dewletê, li Cizîrê jî, weke Şîrnex, Çelê, Pasûr, Varto û gelek cihêndin, bi tanq û topan agir reşand

ser avahiyêñ xelkê. Di vê bûyerê de, ji malbatâ Çağırğa 10 kes hâtin kuştin, 14 kes ji birîndar he-ne. Gelek avahî, dikan û erebe jî, di vê gullebaranê de, xesar dîtin, bi 10 an kes jî di bin çav de ne.

Bûyer, bi êrişike PKK'ê dest pê kir. Panzerek leşkerî, li hêla taxa Cûdî, pêl mayinek gerîlayan dike û 12 tîm têne kuştin. Leşker, ji şerê bi gerîla re direvin û berê xwe didine xelkê. Bi tanqê Alman û topan agir direşinin ser malen xelkê, di vê navê de, gulleylek topê li avahîya malbatâ Çağırğa dikeve û ji wê malbatê 10 kes têne kuştin.

Li Cizîrê, bi deh hezaran kes, bi dirûşme (slogan) û protesto yek girseyî cenazeyê xwe veşar tin.

Li Hêne (Hani-Diyarbakır) jî, hejmarek zêde gerîla, bi ser navçeyê ve girtin.

Tabûra leşkerî, avahîya emniyetê, PTT û gelek avahiyê din bi çekîn girîn kutan.

Dawî der û dorê şûbeya leşkerî girtin û ji bo yê di hundir de ne derkevin derve bang li wan kirin. Lî tu kes ji hundir dermeket. Li ser vî, gerîla vê avahîye gullebaran kirin û 8 kes di vê avahîye de hatîn kuştin. Di vê navê de, grûbek gerîla jî riya Hêne digirin û panzerên ku têne alîkîriyê, dikevin kemîna gerîla û navgîna rastaghdarbûnê.

têne imhakirin. Li vir jî 3 heb polîs têne kuştin.

Li gor daxuyaniya PKK'ê ya Serleskeriya Eyaleta Amedê, di vê bûyerê de, ji zêdeyi 100 leşkerî hatine kuştin.

Di cenazeyê, ew polîsên ku li riya Hêne hatibûne kuştin de, polîsên Diyarbekir bi slogan û êrişan meşek li dar xistin û avahîya HEP'ê gullebaran kirin. Çend malen din jî, ji gulleyen polisan nesibî xwe standin.

Li Şîrnex jî, 2 qereqol ji alî gerîla ve hatîn hîlweşandin û li seriya 20 leşkerî hatine kuştin.

Bi van êrişen gerîla ji xuya di be ku dewlet, di bernameya tunekirina gelê Kurd de û di şerê psîkolojîk de iflas kiriye. Di şerê bi gerîla re de ji xwe nikare bigire û ji ber vê ye ku, piştî her êrişî berê xwe dide gelê bê çek û wan qir dike.

AJANSA BERXWEDAN'Ê

Rastaghdarkirina gel jî, xaleki herî pêwist e. Ji bo gel nekev bin bandûra propagandayê dewletê divê bi nûçeyen rast we-rin agahdarkirin. Bi vî awayî gel, bêhtir bi hêzên têkoşînê ve têne girêdan. Bi baweriya, me, dê ajansta nûçeyan a Berxwedanê, valahîyeke girîng dagire û bibe navgîna rastaghdarbûnê.

Mebûsên HEP'ê ketin greva birçîbûnê

Navenda Nûçeyan- MebûsênPKG (HEP)'ê dest bi greva birçibûnê kirin. Her 18 mebûsênPKG'ê roja 12'ê Mijdarê ji bo protestokirina zilm, zordarî, qedexekirin û şerî qirêjî yên ku dewleta Tirk li hember gelê Kurd didomîne, ketin greva birçibûnê.

Bi destpêkirina grevê re mebûsênPKG'ê daxuyaniyek belavkirin. Di daxuyaniya xwe de sebebê vê grevê bi kurtî wiha tînin ziman

“Îro li Kurdistanê zilm û zordariyek li dijî mirovahiyê tê mesandin. Di serdema me ya ku bi aştî û peymânan mafîn mirov û gelan tîn naşkirin de, dewleta Tirk hemû riyan demokratik li pêşîya çareserkirina pîrsa Kurdî û mafî mirovan digire. Em wek nûneren gelê xwe ketine Meclisa Tirk, lê qene mafî axaftinê jî, ji

me re nayê hiştin. Çiqas cara me xwestiye û hewl daye xwe ku hin pirsgirêkên girîng bînin ziman bi awayen cure cur rî li me hatiye girtin. An der heqê me de daweya idamî hatiye vekirin, an em ji ser kursiyê meclisê bi koteke anîne xwar, an jî, ji aliye çapemêni û berpirsiyaren dewletê ve gotin û daxwazên me yên mafdar hatine berevajî kirin û em wek endamên PKK'ê dane naskirin.”

MebûsênPKG'ê, di daxuyaniya xwe ya 10 rûpeli de li ser imhakirin û şewitandina gundan û qirkirina rewşenbîr û welat-parêzên Kurd ji bi dirêjâhî diskinin û tengasiyên ku rêvebirên dewletê derdixin pêşîya çareserkirina pirsgirêka Kurd protesto dîkin.

Di dawiya belavoka xwe de mebûsênPKG'ê wiha dibêjin:

“Dema em dixwazin bi ser melele an jî problemekê ve herin da ku çareser bibin, wezifedâren dewletê yên sivil an jî resmî tezezul nakin ku bersiv jî bidin me, me wek mebûs nahesibinin, ji ber vê yekê tu feyda me di nav van şertan de nagihîje kesen xwedi problem, ew êdî zehf zirarê me digihîje wan. Armanca me ew e ku hemû gelên ku li Tirkîye dijîn, bibin azad û wekhev. Ji bo pêkanîna şerten biratî, wekhevî û demokrasiyê, em dest bi greva birçibûnê ya demnesi-norkirî dîkin û bala raya giştî û hemû komele û rîexistinê demokratik dîksinîn ser vê rewşa girîng û hemû kesen helwestkar vedixwînin piştgiriya vê hewldana me ya mafdar.”

Mebûsênku ketine greva birçibûne ev in:

Orhan Dôğan, Ahmet Türk,

Selim Sadak, Ali Yiğit, Leyla Zana, Sîri Sakîk, Nizamettin Toğuc, Zübeyir Aydar, Mahmut Emin Sever, Naif Güneş, Mu-zaffer Demir, Mahmut Alınak.

Kartal, Mehmet Sincar, Hatip Dicle, Sedat Yurttaş, Mehmet Emin Sever, Naif Güneş, Mu-zaffer Demir, Mahmut Alınak.


DGM idama 12 endamên HEP'ê dixwaze

Navenda Nûçeyan- Serdozgeriya Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ya Enquerê, der barê kongreya awarte ya PKG (HEP)'ê de, ku di 19 İlona 1992 an de li Enquerê çêbûbû da-we vekir.

Serdozgeriya DED (DGM)'ê idamkirina 12 endamên partiya PKG'ye dixwaze û wan li gorî qanûnê bingehîn (qanûnê esası), xala 125. dadirizîne.

Ji wan kesen ku idama wan tê xwestin sisîyên wan niha gitîne. Ên ku girtîne û der barê wan de ev biryar hatiye dayin; Harun Çakmak, Kemal Okutan, A.Cebar Gezici, Feridun Yazar, Felemez Başboğa, Güven Özata, Hemit Geylani, Şakir Atay, Sultan Uysal, Sabahattin Özslaner, Mustafa Demir, M.Kemal Öztürk. Li Hüseyin Turhallî û Serhat Bucak digerin.

Osman Öcalan: ‘Pêşmerge bê bawerî şer dikir’



Osman Öcalan

Navenda Nûçeyan- Kuman-darê Xarkurkê yê Qerargeha Navendê Osman Öcalan li ser lihevhatina di navbera PKK'ê û Cepha Kurdistanî de çêbû, xeba da. O.Öcalan di hevpeyvîna ku Özgür Gündem, roja 10'ê Mijdarê pê re çekir de rojnameyên Tirkîye bi çewt a-gahdarkirin û berevajîkirina rastiyen súcdar dike.

Öcalan di hevpeyvîne de bi kurtî wiha dibêje: “Ji bo ku zêde xwîn nerije em li hev hatin. Dijmin bi komployan dixwazin berê û gelê Kurd bide hev û wan bi hev bide kuştin, da

ku ev komplö negîhîjin meqse-da xwe em li hev hatin. Ji bo ku em vê firsetê nedîn dijmin, lazim bû me di navbera hêzén Bakur û Başûr de yekîtiyekê dameziranda.”

O.Öcalan li ser sebebê şer ji wiha dipeyive: “Ev şer ji berê ve hatibû plankirin, hêzén Başûr ji aliye Enquerê ve dihatin. a-jotin. Pêşî Telabanî û Berzanî gazî Enquerê kirin, dû re ew da-wetê Washington kirin. Ew da-wet û hevdîtinê wan bi temamî ji bo tasfiyekirina PKK'ê bû. Şerten ku me di vê lihev-hatinê de qebûl kirin, berî şer

jî, ji aliye me ve dihatin qebûl kirin, bes niyeta Cepha Kurdistanî ne lihevhatin bû. Wan şer dixwest, tevî hemû daxwazên me yên aştî û biratiyê wan hin tiştîn din derxistin pêşîya me û êrîşî ser me kirin. Ji wan kirê, wê karibin me di nav hefteyekê de teslim bigirin, lê li hember me, wan xwe negirt û gazi or-diya Tirk kirin. Ne tenê ordiya Tirk, Hêza Çakûç “Çekiç Güç” ji alî wan dikir. Lê dîsa jî, me heta dawî li ber xwe da û PDK û YNK mecbûr man şer sekînandin û me dest bi hevdîtinê lihevhatinê kir.”

Di vî şerî de ordiya Tirk wek garanê bê rîk û pêk dihate bi ser me ve û nizanibû şer bi-ke.

Carna deh gerîlayen me 300 heb ji wan tar û mar dikirin. Zêdeyî 2 hezar û 500 leşkerên Tirk di vî şerî de hatin kuştin.

Pêşmerge ji, di vî şerî de bêyî dilê xwe şer dikir, bi taybetî pêşmergeyên YNK'ê nedixwestin şer bikin, ji ber ku diditîn bi dijmin re bûne yek û şerekî bê armanc dimeşînîn. Lê me zanibû em mafdar in, ji ber vê yekê, me bi bawerî û bi dil şer kir û em bi ser ketin.”

Kurd heyfa derengmayînê hiltînin

Swêd, Welat- Rojê hilbijarti-na Meclisa Neteweyî nêzîk di-bin. Ev roj 20, 21 û 22'ê meha Mijdarê ne.

Çalakiyên ji bo Meclisê têne kirin ber bi roja hilbijartîne ve gurrtir û tekûtzir dibin.

Hefteya ku li bajaran Swêdê cîvîn neyîn kirin û beren-

dam, propagandaya Meclisa Neteweyî nekin tune.

Cîvînên têne çekirin germ in, bi minaqeşan dagirtî ne û heycana wan bê qedar e.

Berendam û hemwelatiyên me li derveyî welat û li vir li Swêdê heyfa derengmayîna salan û sedsalan hiltînin û ji kêfa

Meclisê re lingên wan erdê na-gire.

Di cîvînên mezîn de, beren-dam xwe didin nasandin, axaftin û xwenasandinê wan bi zarav û devokên cihê dîbin. Hin bi Kur-mancî, hin bi Soranî û hîn jî bi Behdînanî qise dîkin. Hin ji wan Zaza ne, hin Kurmancî in û hin ji Soran in. Hin ji Kerkükê hin ji Urmiye, hin ji Zaxo û Qa-miyo ne, hin ji Mereşê, hin ji Kurden Enedolê, hin ji Amedê, Batmanê, Şirnex û Nîsebînê nc.

Demokrasiya cîvînan, tole-rans, tehemul û rezdariya ji he-vûdu re xurt e, balkêş e û hêjayê gotinê ye.

Xelk dipirse, berendam ber-siv didin, rola meclisê, wezin û giraniya meclisê, mane û nave-roka meclisê, ferqa vê meclisê ji ya Başûr, ji pîrsen esasi ne û da-başen munaqeşê ne.

Her civîn dibe qaseten video dibe belge û wesîqe. Em li Kur-distan Centrume rûniştine û li cîvînên meclisê bi hev re li video temaşe dîkin. Heta niha 21 heval ji bo Meclisa Neteweyî muracat kiriye. Axaftin û xwenasandinê wan berdewam in. Niha Karwan Caf qise dike. Karwan ji başûrê Kurdistanê ye û li bâjarê Kerkükê hatiye din-yayê.

Karwan di çend xalêl zelal de ferqa nav Meclisa Başûr û Meclisa Neteweyî dixe ber çava-n û kêmâsiyên Meclisa Mesûd û Celal dihejmêre: “Ev meclis ne Kurdistanî ye, ji heştan yekê gelê Kurd temsîl nake. Mesûlê şerî nav gerîla û pêşmerge ye. Meclisek xwedî sîc û xwedî guneh e. Ev meclis bi emrîn derve çêbûye û ne serbixwe ye. Lîska dewleta Tirk û împeryalîzmî

ye.” Bi dû Karwan re Seyidxan Anter xuya dibe. Dora Seyidxan Anter e. Di desten wî de rojnameyê bi destê çepê hildide. Di pelê ewil de wêneyeke Mesûd, Celal û Hikmet Çetin berbi kamerayê dibe. Seyidxan Anter agir li xiyanet, paşverûti û hevkariya bi împeryalîzmî ve dîbarîne û go-tinê xwe wiha diqedine. “Mi-rin ji ku de tê bila bê.”

Berendamên din ji; Robin û Nevîn Rewşen, Sebri Akman, Mele Osman, Reşo Nergiz, Fexî Reşit, Silêman, Semra, Xidir, Beşir, Salih û Mîrhem ji, ji awirê cihê û hevûdu temam kir, li ser mesela Meclisê, şev û guhertinê dawî diskinin û xwe didin nasandin.

Her civîn bi Ey Reqîb diqe-de. Civîna dawî ji wiha dibe.

Turgut Atalay hat birîndarkirin

Navenda Nûçeyan- Serokê Belediya Amedê Turgut Atalay, ji ali 3 kesan ve bi êrişek hate birîndarkirin. Di vê êriş de, parezgerê Atalay hate kuştin, şofêrî wî ji birîndar bû.

Êriş roja 12.11.1992 an, êvarê saet di 22.30 an de pêk hat. Êrişkar pêşî erebeya Atalay gullebaran kirin. Dawî ji bombe avêtin erebeyê. Turgut Atalay û şofêrî wî bi birîndarî rakirin nexweşanê. Ji ali mirinê ve talûkeyek nîn e.

Rojnameyên Tirk, ev bûyer wek livbaziyek PKK'ê dinirxin. Lî, êriş ji ali kîjan hêzê ve hatiye kirin, ne diyar-e.

PÊNÛS



Amed Tigris

Stenbol û demokrasî

Tirkîye welatekî seyir (ecayip) e. Neteweya Tirk bi xwe seyir e. Hilbijartina belediyan a dawî seyirbûna Tirkîye careke din baş da xuyakirin. Di vî waride bajarê Stenbolê bû seyir û seyrangeha Tirkîye. Stenbol bajarê Tirkîye yê herî mezîn e. Lingekî Stenbolê li Asya û lingê din jî li Ewrûpa ye. Tirkîye bi Stenbol dibe Ewrûpi. Stenbol Ewrûpa ye. Stenbol bajarê dîrokî û kulturî ye. Navenda zanîn û kultura Tirk û Ewrûpiyan a hezar salan e. Stenbol bajarekî endustrî ye. Navenda karkeran e. Bajarê ilm, iîfan û proletarya ye. Bi kurtasi bajarê Stanbolê, pîvana zanyarî û demokrasiya Tirkîye ye.

Lê..

Lê, Stenbola Ewrûpi, navenda zanîn, kultur, ronakbir û proletaryayê, di hilbijartina borî de bûbû navenda militârîzmê. Navenda partiya Özal A-NAP'ê. Lê niha bû navenda fânatîzmâ dînî. Navenda Partiya Erbakan. Partiya Refahê. Ev hilbijartina dawî nişan dide

Li Tirkîye kemalîzm pûc bûye. Genî bûye dirize. Piştî 70 salî, dîsa dixwazin careke din xilafetê bînîn Tirkîye. Stenbol û Tirkîye dikare bi paş ve vegerin xilafetê. Lê gelê Kurd bi idolojîk, politik û eskerî pişta kemalîzmê şikandiye.

ku bajarê Stenbolê careke din dixwaze bibe paytexta xilafetê. Bajerekî wek Stenbol ku navenda Ewrûpa ya Tirkîye, navenda entelektuel û navenda çîna karkeren Tirk be û ew bi xwe bibe navenda militârîzm û ya fânatîzmê. Xwedê Konya, Çorum û bajarê Anatolên din ji Erbakan re bîhêle (!) Lê pîroz bê (!)

Stenbol nîşana demokrasiya Tirkîye, nîşan û pîvana zanîn û hişyarbûna çîn û qadêne ronakbir û proletarya Tirkîye ye. Nîşan û pîvana kozmopolîtzmê ye. Di bin gehê xwe de, yêne gunehkar, ronakbir û pêşengêñ çîna karkeren Tirk in. Ew heta iro li diji dewleta xwe, politikayeke radikal, gelêrî nedane pêş xwe. Bi taybeti di van 70 salêne dawî de, li diji Kemalîzmê derneketine. Heta li ser navê şoreşgerî û pêşverûtiyê, kemalîzmê bi awayeke dizi û eşkere parastine û diparêzin. TKP û partiyen destbirakên wê çîna karker û xebatkaran, 70 salî li ser navê komunîzmê û sosyalîzmê sîstema kevneperek parastin. Bi belebûna Sovyetê re, hinek ji wan xwe belav kirin û hinek jî raste rast di nav partiyen sîsteme de dest bi kar kirin û dîkin. Karker, xebatkar û ronakbirêne Tirk, ji salan ve zehmetiyen rîxistineke bi ideoloji politikayeke serbixwe û şoreşgerî dîkişinîn.

Gelo ci ferq di navbera partiya Demirel û ya Erbakan de hene? Qet! Gelo ji Refahê heta Partiya Karkeran a Doğu perinçek ci ferq di nav wan de hene? Bersiv dîsa heger qet nebe jî, lê gelek ferqên biçük hene. Di bin gehê xwe de, hemû kemalist in. Misakê Milist in. Hemû Tirkêne musulman in. Hemû dagirker û kapitalist in. Mane ev Erbakanê musulman bû ku dî hilbijartina giştîya borî de, bi faşistê Turkeş re hevkariye kir.

Li Tirkîye kemalîzm pûc bûye. Genî bûye, dirize. Piştî 70 salî, dîsa dixwazin careke din xilafetê bînîn Tirkîye. Stenbol û Tirkîye, dikare bi paş ve vegerin xilafetê. Lê gelê Kurd bi idolojîk, politik û eskerî pişta kemalîzmê şikandiye. Dê di demekê nêz de wî bixe gorê. Lê, xilafet jî li xwedîyê xwe pîroz be. Ka Tirk demokrat bûn? Ewrûpayî bûn? Bi boyaxkirina porê zer û çavêş şîn û qerewat girêdanê tu kes nikare bibe Ewrûpi. Ewrûpibûn mantelîtet e. Kemalîzm mantelîteteke paşverû û nîjadperest e. Tucarî nikare bibe Ewrûpi.

Pêşgotina 'Rûpelê Elfabeyê'

Konê Reş

Da ku em serwextî çiroka berhevkirina elfabeyâ Kurdi Latinî bibin, hêja ye ku em pêşgotina ku Celadet Bedirxan di serê pirtûka bi navê "Rûpelê Elfabeyê" ya ku wî berhev kiriye û di sala 1932 an de, li Şamî çap kiriye di bin hejmara "2" an de ji pirtûkxana Hawarê û hem jî di Kovara Hawarê de, hejmara "13" an çap kiriye ku em bixwînin, hingê emê xweşik serwextê çirokê bibin, de ka werin bê Mir ci dibêje:

"Bi şes hejmarêne Hawarê yêne pêşin me hin rûpelêne elfabeyâ belav kiri bû, bi wan rûpelan me, hîmî elfabeyâ Kurdi - Latinî û ji xwenda û zanayêne Kurdan, fîkrêne wan li ser elfabeyê pîrsyar dikirin. Ji ber wan rûpelan sed û pêncîh dest mabûn. Min dil nekir ku ew rûpelêne ha wanda bibin. Min ew dane hev û çend rûpelêne din bi ser xîstin û pêkitêbokek hate pê. Ev kitêboka ha, bîra elfabeyâ Kurdi a pêşin e, ku nîşê dawiyê lê fedgirin (vegerin) û pê bizanîn ka pêşiyen wan di çi tunehiyê de elfabeyâ pêşin dabûn çapkirin. Ji bona pîkanîna çermê wê diviyabû, ku çend rûpelêne din bikevin pêşiyê.

Bi vê hîncetê, min dil kir ji xwendevanêne xwe re berpêkirina elfabeyâ me bi kurtî gîlî bikim (ango li ser baxivim).

Ev elfabeyâ hanê, ku iro em zmanê xwe pê dînîvisin paşa xebateke salinê dirêje.

Di sala 1919 an de, me dabû Çiyayê Meletyê. Em ketibûn nav eşîra Reşwan. Mêcer Nôwel (İngilîz) ji di gel me bû. Mêcer zarê nîvro dizanibû, dixebiti ku hînî zarê bakur bibe û ji xwe re her tiş dînîvisand. Min jî hin medhelok, stran û çirok ber hev dikirin.

Carinan me li nîşarêne xwe çavêne xwe digerandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi lîvkirineke biyanî, lê bê dijwarî destnîvîse xwe dixwend, lê belê ez, heta ku min (û, 9) ji (o, 9) û (i, 5) ji (ê, 5) hi derdixistin, diketim ber hezar dijwarî, ma çiman...? Ji ber ku Mêcer bi herfîn Latinî, lê min bi herfîn Erebî dînîvisandin.

Ser vê yekê, di cih de min qîrara xwe da û ji xwe re bi herfîn Latinî, elfabeyek lêkanî (pîkanî).

Edin minê bikariya destnîvîsa xwe paş hezar salî be ji bê dijwarî (dijwarî) û weke xwe bixwînim, ji ber ku her deng cihê-cihê li ser kaxezê dihate sekinandin.

Lewra ku di elfabeyâ Latinî de tenê (26) herfîn serxwe hene û di zimanê Kurdi de deng ji bîst û şesan bêtir in, gelek herfîn hevedudanî ketibûn nav elfabeyâ min, weke:

ceh, ou, ai

Ji xwe, di zarotiya xwe de, wextê min di dibistanan de, dixwend û hînî herfîn Erebî û Latinî dibûm, tiştek hebû ku min di çavê xwe re dikir û ji bona herfîn Erebî, di dilê xwe de digot: Ev elfabeyâ welê ye ku dengin dide xwendin ku nayêne nîşandin û Latinî yekcar vajiyê wê ye, herfin dide nîşandin ku nayine xwendin.

Belê fikra min di babeta van herdu elfabeyan de ev bû, bawer bike, bi vê fikra ku min ji zarotiya xwe re di serê xwe de xwendî dikir keta (kêfa) min ji herfîn hevedudanî re ne dihat.

Hingi ji zmanêne ku bi herfîn Erebî, nîşandin min Yûnanî, hînî Frensiyî û elfabeyâ Rûsi nas dikirin. Hema di ciyê de, rabûm hercî herfîn hevedudanî ji elfabeyâ xwe derxistin û li şuna wan ji elfabeyâ Yûnanî û Rûsi herfinê serxwe existin.

Bi vî awayi min elfabeyek bi "Sîh û Şes" herfîn serxwe existibû destê xwe.

Wekî em vegeryan hatin Stenbolê bi vê elfabeyê min kitêbeke elfabeyê û ferhengeke kiçik nîşandin û ji bona çapê kar kiribûn. Lê mixabin ne ew elfabeyê, ne ji ew ferheng, iro ne di destê min de ne.

Di salâ "1925" an de di gel hin nîşarêne min ên din gehîştine heta pêşberî Mehkema Xarpûtê.

Sala 1924 an de, li. Elmanayê min careke din çavê xwe li elfabeyâ xwe gerand, hûr lê mîze kir û mideke xweş li ser xebitîm. Min bala xwe dida û didit ku ev sê texlit herf qenc li hev nedihatîn, herfîn Yûnanî û



Mir Celadet Bedirxan

Rûsi yekrengiye elfabeyê xerab dikirin. Ji wê pê re tê de du herfîn ku ji me re ne gerek bûn. Ji lew re min elfabeyâ xwe ji nû ve senifand: Herfîn zêde jê avêtin, hin herfîn Latinî bilindek li wan bar kirin û di şuna herfîn Yûnanî û Rûsi de existin. Bi vî awayi elfabeyek bi "Sîh û Çar" herfan û yekreng hate pê.

Ez paşê ji bi elfabeyâ xwe mi-jûl bûm. Lê hetanî ku Tirk elfabeyâ xwe belav kirin -1928- ya me weke xwe dima û tê de me tiştekî bingehî nediguher. Min her tişten xwe pê dînîvisandin û nasen xwe re dida zanîn.

Wextê Tirkan elfabeyâ xwe belav kirin, me dit ku di dengen hin herfan de, elfabeyen me ne mina hev in. Dengin hebûn kû Tirkan ne bi wan herfîn ku me nîşan kirine, lê bi herfinen din nîşan kiribûn.

Herweki me berê ji çend çaran gotibûn, ji bona hîsankirina xwendîna nîşarêne me, ji Kurdishî Tirkiye re, me dengen hin herfan bi hev guhertin û herçend hebû, me ew çend elfabeyâ xwe xist nîzingi elfabeyâ Tirkan.

Ji gotinên jorîn qenc xuya di-bê kû, elfabeyâ me paşıya xebateke "Sêzdeh salîn" e, gorazmanê Kurdi gora dengen zmanê me ye. Herê ev elfabeyâ beri "Sêzdeh" salan hatiye nîşandin û gora zmêne û dengen wî, hin bi hin edili û ket halê xweyê iro.

Beri û piştî belavkirina elfabeyê, min fîkrêne gelek kesan pîrsin û gotinêne hînkan bi kêri min hatiî. Di nav wan de, mironîn yekcar nexwenda ji hebûn.

Ji lew re ez vê elfabeyê, ji ke-da xwe bêtir keda mîletê xwe di-hesibînim û pêşkeshi wî dikim.

Jixwe hercî yê wî ye, ji yê herkesi hêjatîr u spehît e."

Celadet Ali Bedirxan
28 è Çêrya paşî 1932
Taxa Kurdan Şam

'Ber-Ha' damezirî

PKK bi navê "Ajansa Xeberan a Berxwedan" ajanseke xeberan damezirand. Heta niha ji bi awayekî periyodik li Ewrûpa rojnameya Berxwedan derdixist. Der heqê vê ajansê de, di daxuyaniya xwe ya ku li navenda rojnameya Berxwedan a li Dusseldorfê ye de, dîtinén xwe wiha pêşkêş kirin.

"Bakurê Kurdistanê û Rojhilata Navîn ji aliye stratejiyê ve di nav mîzinên dînyayê de, cihêkî pirr girîng digire. Ji ber vê yekê ji armanca her yek hêzên li herêmê ewê ku, hemû livbazî li gor berjewendiyê wan pêk werin. Lewre ji mirov der heqê bûyerên li herêmê de nabe xwedî agahiyên rast û objektif. Bi taybeti ji, şerê li Kurdistanê û rewşa wê ya iro bêsansur derbasî xeberên ajansan nabe. Jixwe welatên împeryalist weke ku di xeberan de, ji objektifbûnê, dûrbûna wan ne bes be vêca xeberan tevî bi awayekî derewîn pêşkêşî gel dikin û di vî babetî de dibin wasîte ji şerê psikolojiyê re."

Berpîrsiyarê ajansê ji bo vê xebata xwe û pékanîna wê ji wiha dom dike. "Li temamê Kurdistanê û Rojhilata Navîn nûçegihanen (mûxabîren) me ji bo vê xebatê amade û rîxistîndar in, ci bûyer bibe di cih de emê temamê dînyayê bi awayekî objektif agahdar bikin. Em niha li Ewrûpa û li bakurê Amerika ji rîxistîndar in."

Ajansa xeberan a Berxwedan, ji vê hefteyê û pê ve dest bi xebatê xwe kir.

Pirtûkêni bi zincîrkirî

Fûara TUYAP'ê (Yekitiya Weşankarêne Tirkîyê) di 6 ê Mijdarê de li Qesra Raxistghehê a Stenbolê vebû. Nêzîk 250 weşanxane beşdarî fûarê bûne. Fûar wê hefteyekê dom bike. Di standa weşanxaneya Yurt de 13 pirtûkêni İsmail Beşikçi yên ku ji aliye DGM'ê ve hatibûn komkirin bi zincîran girêdabûn û raxistin.

Weşanxaneya Melsa ji, pirtûka Abdullah Öcalan 'Kadın ve Aile Sorunu' û ya İsmail Beşikçi 'PKK Üzerine Düşünceler' her yek ji wan wek nimûne raxistibûn. Roja yekşemê polisîn siyasi li standa weşanxaneya Melsa, Yurt, Kaynak û Yôn geriyan û pirtûkên Abdullah Öcalan, İsmail Beşikçi û Musa Anter kom kirin. Polisan ji Melsa İlyas Burak, muxabîren 2000'e Doğru û Tevhid girtin. Pişti vê bûyerê weşanxaneya tev de standê xwe girtin û bi çepikan polis protesto kirin. Bi saetek sün de girti berdan. Di 11'ê Mijdarê de İsmail Beşikçi ji bo çapemeniyê civinek çekir û komkirina pirtûkan protesto kir.

Çend gotin li ser 'Kevoka Spî' û rewşenbîrtiyê

Mazhar Günbat


Kevoka spî pirtûkeke çîrok û serpêhatiyan e. Di pirtûkê de heft çîrok hene. Heta niha pirtûkên di vî rengî de pirr dermekine. Çirokên di pirtûkê de edî zehf li ser rewşa rewşenbîren Kurd ên bi kompleks, nexwes, biyaniye xwe û gelê xwe sekiniye û têkili û jiyana wan a bere-dayî û sûnî, bi awayekî komik û rexnegiri tine ziman. Di hin çîrokan de ji, li ser evîn û hesret, ji bo welêt hatiye rawestîn.

Di vê nivîsê de em dixwazin pirtûka Cewerî ji aliye naveroka wê ve binirxînin û çend gotin ji, li ser rol û peywira nivîskarêne Kurd bibêjin. Her berhem divê li gor dem û rewşa ku tê de hatiye afirandin, were nirxandin. Hêjabûn û pêwistibûna berhemekê, girêdayî şert û pirsgirêkîn jiyanê ne. Girîngiya pirsgirêkan ji, ji bo her welat û gelî diguhere.

Pirsgirêkîn ku ji bo Ewrûpiyan di derecaya heyati de ye, dibe ku ji bo gelê Kurd, ji aliye girîngiyê ve talî be. An ji pirsgirêkeke ku berî deh salan ji bo gelê Kurd ji aliye girîngiyê ve di dereca yekemin de bû, dibe ku di şertîn Kurdistanâ iro de ji rojevî derketibe û tiştekî zêde ifade neke.

Iro gelek nivîskarêne Kurd ên bê rîxistin, ku li Ewrûpa dijîn; an problemen psikolojîk, ên ku edî zehf ji bo Ewrûpiyan pirr girîng in an ji problemen Kurd ên ku iro girîngiya xwe winda kiriye, dinirxînin û li ser wan serê xwe dişinîn.

Rewş û problemen ku di "Kevoka Spî" de cih girtine; her çiqas girîng bin û çareserkirin û nirxandina wan pêwest be ji, dema rewş û şertîn Kurdistanâ iro li ber çav bêngirtin, hingê babeten ku Firat Cewerî li ser sekinîye, di kerteya girîngî û pêwestiyê de talî dimînin. Wisa xuya dike Cewerî ji wek gelel



Kevoka Spî, rewşa rewşenbîren Kura di awayekî komik û rexnegiri ûne ziman.

nivîskarêne Kurd ên li Ewrûpa dijîn hînek di bin tesîra jiyana Ewrûpa de maye.

Ew bi xwe bi van çirokên xwe, van rewşenbîran, bi awayekî ironik rexne dike, lê dema mirov bi giştî li ser berhemên Cewerî disekine, dibîne ku ew ji, problemen psikolojîk û intellektüel ên rojavayı derdixe pêşîya hemû probleman û dikeve nav cynî çewtîyen van rewşenbîren Kurd ên ji problemen gelê xwe dûrketi.

Cewerî hînek tişt û problemen pirr girîng zêde îhmal dike an ji qet li ser wan nasekine.

Helbet tu kes formuleke vekirî ji bo çareserkirina problemen jê naxwaze, bes qet nebe tesbîtkirina sebebîn wan pêwest e. Cewerî, tenê li ser encama pirsgirêkan disekine û komîkbûna rewşenbîran pêşkeşî xwendavan dike.

Em li vir naxwazin bibêjin ku edebiyat divê çareserkirin hemû pisgirêkîn civakê ji xwe re bike wezîfe û em nabêjin bila tenê çend problemen pingehîn ên bi sîparîs deyne ser milê xwe, ji xwe mafê tu kesi ji tune edebiyat û hunerê bi qeyde û formulen teng û şablonî çepet bi-

ke. Lê, li aliyê din mafê tu nivîskar û hunermendî ji tune ji hînek berpîsiyariyê rewşenbîri û welatparêzi bireve.

Wezîfe û berpîsiyariyâ edebiyat û huneña her gelî mecbur e li gor şert û problemen heyî bêne tesbîtkirin. Hunermend û nivîskarekî Kurd, we divê bila bi devê xwe civîkan bigirin, we divê ji bila ji aliyê hemû komele û rîxistinê Ewrûpi ve bén xelatkirin û takdîirkirin, ji bo gelê Kurd ew bi nêzîkbûn û berpîsiyariyâ xwe ya têkoşîna neteweyî û azadiya gelê xwe tên nirxandin.

Iro ku li Kurdistanê her roj bi dehan mirov bêne qetîkîn, gund û bajar bêne şewitandin û hilwesandin, çiya û deşten Kurdisatanê bêne bomebarankirin û di welatê xwe de mafê jiyanê ji gelê Kurd re neyê hiştin û tevî vê ji, kesen ku xwe rewşenbîri û nivîskarêne Kurd dibînin, qet nekevin nava gelê xwe û bi dil û can xwe nedîn têkoşîna gelê xwe van problemen pingehîn neynîn ziman û tenê hin babet û meseleyê talî her dem derxin pêşîya yêngî pingehîn, hingê hûner û jêhatibûna wan bi kérî gelê Kurd nayê û ji bo gelê Kurd bê mane ye, belki ji zerar e..

Gotinê me nayê wê maneyê ku ev pirs û pirsgirêkîn talî divê nebin babeta pirtûk û lêkolînan. Helbet divê hemû pirsgirêk bêne nivîsandin û nirxandin, lê lazim c ku şert û problemen ku gelê Kurd iro tê de dijî baş bêne tesbîtkirin û li gor girîngiya xwe divê rîza yekemîn, duymîn an ji dehemîn bigirin.

Bi taybeti iro, ev ji bo me lazym e, ji ber ku gelê Kurd iro di rewşekê pirr dijwar de ye.

Nivîskar û hunermend çiqas bi problemen gelê xwe ve dakevin wê qiyemet û hêjabûna wan ji hewçend zêde bibe.

Çalakiyên Navenda Çanda Mezopotamya

Navenda Nûçeyan- Navenda Çanda Mezopotamya, ji bo ku çalakiyên xwe yên hûnerî, wêjeyî, wêneyî... û çandî bi gel bide nasîn û genteşîyan (munâqşeyan) li ser gelemşeyen çalakiyên çandî li dar bixe, di navbera rojîn 14.11.1992- 21.11.1992 an de hefteya çandî amade dike.

Rêveberiya Navenda Çanda Mezopotamya, pêvajoyê wiha şirove dike. "Iro li Kurdistanê çandake nû tê avakirin. Ev jiyan, gelê Kurdistanê azad dike. Mirov, di vê jiyanê de azad dike. Li sûna nemirovahî, koletî û zordestiyê, nirxên mirovî yên payebilind têbicihîrin. Tevgera a-

zadî ya Kurdistanê, riya mirovahî vedike." Û sebebê kirina hefteya çandê ji wiha tîne ziman. "Navenda Çanda Mezopotamya, ji bo li pirsên piş, wêjeyî û çanda Kurdi gotûbêj bête kirin û ji bo pêşangeha çalakiyên komên xwe yên hûnerî, konferanseke çandî amade dike."

Bernameya "Hefteya Çandê" ji wiha ye. 14.11.1992. Vebûna Pêşangeha Wêneyê Cih: Navenda Çandê saet 13.00

A. Memedoğlu, M. Nayır, F. Bilge, S. Danışman, A. Yaşar, A. Aksu.

16.11.1992: Panel/ Apê

Musa. Cih. Enstituya Kurdi saet 17.00

17.11.1992: Dia: Mirov û Jiyan li Kurdistanê. Cih: Navenda Çanda Mezopotamya

18.11.1992: Hevpeyvîn li ser muzîka Kurdi/ Pêşkêşkirina stranan. Cih: Navenda Çanda Mezopotamya

19.11.1992: Hevpeyvîn li ser wêneya Kurdi. Cih: Navenda Çanda Mezopotamya

20.11.1992: Şahiya Zarakan Cih: Pendik Atatürk Kültürevi saet 19.00

Vebûna Konferansa Çandê Cih: Pendik Atatürk Kültürevi Saet: 11.00

Koma Serhildan: Folklora Amedê: Saet 18.30

Şanoya Jiyana Nû: Mirin û jiyan (Leystika du perdeyi) saet 19.00

Koma Serhildan: Folklora Pirrinê (Adiyaman) saet 20.30

Navenda Çanda Mezopotamya, ji saleki zêdetir e ku hatiye damezirandin. Navend, di navbera vê demê de gelek çalakiyên çandî bi rîxistîye. Xebatan, der barê, sinema, şano, govend, muzîk, çalakiyên wêneyî, dagirtina kaseten Kurdi, derxistina kovar û pirtûk, çekirina şev û turneyan de kiriye û hîn ji çalakiyên wê berdewam in.

Dinya alem dijminê kewê ye kew dijminê qewmê xwe ye!

Ji her demê bêhtir, dema kirina vê pirsê ye îro: Gelo çîma hêzên Başûr ku dixwazin xwe mîna pêşengêñ tevahiya Kurdistanê nîşan bidin, her dem ji şerê birakujiyê re têr û xurt in? Bi dehan sal, di nava xwe de xwîna ku rijandin, serdestiya Baas'îyan li ser gelê me tundtir û xurttir kir.

Kurdino! Merdino! Namerdêñ dijminan nebin! Lûleyêñ çekan bizivirînin ser dijminê herî mezin Tirkîyê! Hîna heta du sal berê programa kemalîzmê têkbirina nav û nîşana Kurd û Kurdistanê bû. PKK'ê, bi wê bergirî û hilawistina xwe ya merdane vê pîlanê têk bir, ji qurmê hilweşand. Me ci car sûd û kelkek ji serîtelandinê nedîye. Divêt dirûşma Kurd heyâ rizgariya serhildan be. Xwe nexapînîn. Dijmin ci car nebûne dost.

Bavê Berzan

Ji zemanêñ kevin, hetanî roja îroyîn, sedemeke geleki eşkere û diyar a parçebûna me Kurdan ev bûye, ku me her dem kevir biriye ji bo lêkirina kokelêñ dijminan. Me bi vi awayî, mala dijminê xwe ava û ya xwe ji xerab kiriye. Her weke kewê...

Werin li naziyêñ dîrokê binihêrin: Kew, ji nav sewal û heywanan, dawera (simbol) jîna siruştâ welatê Kurdan e (!) Nêçîrvan, kewê xwe yê kedî difirînin û xwe li kemînê ditelînin. Hingê kewê nêçîrvanan diçê nava kewen din û wan dixapîne ber bi kemînê nêçîrvanan dihêne. Kêm candarêñ ser ruyê erdê, vê bêbextiyê li hogir û hempayêñ xwe dikan. Kew vi tiştî bi hêsanî dike. Her wişa ji, kêm gel û mileten cihanê, vi tiştî bi serê xwe de dihênin. Lê ji bilî me Kurdan... Em ji vê bêbextiyê bi hêsanî dikan. Her weke kewen xwe, bi dijminê xwe re, li diji gelê xwe bi çavgirî ti şer dikan.

Ji her demê bêhtir, dema kirina vê pirsê ye îro: Gelo çîma hêzên Başûr ku dixwazin xwe mîna pêşengêñ tevahiya Kurdistanê nîşan

U caşî şest û şes... Paşê berê xwe dan Kurdên Rojhilatê û vêca bi wan re xwînrijiya birakujiyê kûrtir kirin. Ew ji têr nekir, di serê payiza 92 an de, bi ferمان û direktifêñ Amerika û bi payende û hempayiya leşkerên Tirk ve, êrîşê birin ser hêzên Kurdên Bakur. Xwedê mirov ji van kewan biparêze! Ci kew, ci kew? Kewen wisa nadîde!


Xwestina wan a veşartina vê bêbextiyê ji, ecêbmayineke bi serê xwe ye. Bi sedan Kurd li ber çavêñ serbazên Tirkan remî dikan -mina ku ew ne di bêbextiyê de bin lê- ew Kurden ku remî dibin di bêbextiyê de bin! Sedem ci ye? Ew piştgir û layangirêñ serhildanê ne, lewma remî dibin! Diyar e ku tîrsa şoreşgeran kûr ketiye dilê wan. Li weleten ku şerê rizgariya civakî û neteweyî berdewam

bûn, her eynî cûre remîkîrin dibûn. Bi "bêbextî û hevxebatkariyê" ve tewandar dibûn van ên remikirî. Lê tiştê ku remiker dikirin ci bû? Li ser gel û welêt, bêbextî û hevxebatkariya herî mezin Kirinê wan bû.


Wan, bi dehan sal, mirov û heta rêxistinêñ xwe li Bakur bi cih dikirin, me Kurd ên Bakur, ci (tu) mirovên wan remî nekir. PDK'ê sekisiyona xwe ya Bakur PDK-T'ê bi dehan sal ji Başûr bi rê ve dibir. Paşê KUK ji hêla Qiyada Muweqqet'ê (ya Mr. Sami Rehman) hatibû danîn. Érişa ku KUK'ê di destpêka bihara sala 1980'yi de, bire ser PKK'ê, yekser û sererast bi direktif û talîmaten dostê Amerika û Brîtaniyayê, bi direktif û talîmaten Samî Rehman ve dest pê kir. YNK'ê (grûboka Mr/Bay Telabanî) ji li bakurê Kur-

distanê, DDKD (Pêşeng) û bi rê dixist. Îro roj, hêzекe welatperwer li Başûr bi navê PAK'ê derketiye û piştgiriya şerî li dijî dijminê herî mezin Tirkîyê dike, ji ber vê hindê ye, ku bûye çiqil û ketiye çavêñ dostê Tirkîyê! Lewma piştgir û layangirêñ vê livê di çavêñ wan re dihere.

Kurdino! Merdino! Namerdêñ dijminan nebin! Lûleyêñ çekan bizivirînin ser dijminê herî mezin Tirkîyê! Hîna heta du sal berê programa kemalîzmê têkbirina nav û nîşana Kurd û Kurdistanê bû. PKK'ê, bi wê bergirî û hilawistina xwe ya merdane vê pîlanê têk bir, ji qurmê hilweşand. Me ci car sûd û kelkek ji serîtelandinê nedîye. Divêt dirûşma Kurd heyâ rizgariya serhildan be. Xwe nexapînîn. Dijmin ci car nebûne dost.



Hinek "serokatiyêñ Kurdan" Her weke kewen xwe, bi dijminê xwe re, li diji gelê xwe bi çavgirî şer dikan.



Diya min û tenûr

Tenûra min çima bê dar û arî?
Berê sor bûy çima îro tu sarî?

Ciwan bûm ez sivik min nan dipêja
Çiqas xweşbûn bi germî û bi sarî!

Mi qırş tanîn berî ku roj hilata
Nizananî min giranî û xewarî

Minê dada tenûra xwe bi gurgur
Hevîrê xwe dikir bê alîkarî

Ku pîrbûm ez nema karim hevîr kim
Li ber çavê min dinya bûyc tarî

Geya şin hat li ser piştâ tenûrê
Li hawîr qırşık û tiştîn gemarî

Li ser dev kon vegirtî pîr-ebokê
Tenûra min biwe kavilkî tarî

Diya Jano ciwanî hêc nema tê
De hêsrên xwe bi kerrlalî bibarî.

Bersiva tenûrê

Diya Jano ez jî wek te dinalim
Li ser rojîn xwe yên borîn dinalim

Dipirsim ez jî xwe her gav û her dem
Ci zû borîn li me ew mah û salim?

Li ber çavê min in ew rojê borîn
Dema ku tú ciwan bûyî... delalim.

Te ağır berdida can û dilê min
Dibûn dojeh gelek pêtî li bal im

Dibûm ar lê niha arîme sar im
Li ser te ez qirik tal im, dinalim.

Dema germ bûm hemû bo min heval bûn
Ku sar bûme niha ez bê heval im.

Diçin têr û di ber min re dibûrin
Kesi rokê nekir pirsek li hal im.

Weke bîrek ziwa me ez di vir de
Ji ber gerş û gemarê rengê çal im.


Erê xwakê ciwanî çû nema tê
Emê ci bikin felek bêbext û zalm.

Jan Dost



AZADÎ

Abdurrahman Durre



De here lo...

R ehma Xwedê li dê û bavê û li Seydayê Mele Zahirê Tendûrekî be (Mele Zahir, yek ji melayên Kurdis-tanê, yê bi nav û deng bû. Di sala 1966 an de, li Tendûreka Melazgirê çû rehmetê. Emrê wî li der û dora 85–90 salan bû).

Digot: "Ez rojekê li medresê-(mizgeftê) bûm. Min dersa feqîyan dida. Çend rûspiyênd gund jî li ba me rûniştibûn. Min dît, derwêşek, defa wî di milê wî de hat, li koşeyeke mizgeftê rûnişt, min jî merhabatî dayê û li dersê dewam kir. Gundî jî li derwêş civîyan û pîrsan jê kirin, derwêş jî, dest pê kir û da ser hev. Min jî hem dersa xwe didomand û hem jî guhê xwe didayê. Min dît ku derew û virênen seket dike. Min gazî kirê, anî ba xwe, cixareyek jî dayê û min jê pîrsî: 'Derwêş Baba, tu çend salî yi?' Got: 'Seyda, ez şêst-şêst û pênc salî heme.' Min got: 'Maşelâh tu pîr tîstan dizanî, di-xuye tu li dinê pîrr geriyayî.' Ku min jê re wiyo got, derwêş werimî, xwe qure kir û got: 'Belê seyda, ez li pîrr deran geriyame, cih nemaye ku ez neçûmê, ez çûme Bex-

Ger Seydayê Mele Zahir ni-ha sax bûna û guhê xwe bi-da van xeberên berevajî, hevnegirtî dij û vîj, wê ji wan re jî bigota: De herin lo... Bi rastî jî, evqas vir nayênen kirin. Gotineke pêşîyan heye, dibêjin: "Xwezi, kî virek bikira, pê re tirek jî bikira."

dayê, Besrayê, İranê, Hindistanê, Misrê, Yemenê, Meke û Medîneyê, Quds û Şamê û birrek cihîn din.' Min bala xwe dayê ku derwêş, kûpê viran e, divê ku ez virênen wî, bi awa-yek wiyo derxim meydanê ku, guhênen wî weke guhênen keran sist bibe û bive pêkenînê cemaetê." Seyda digot: "Min tizbiya xwe bi dizî da destê xwe û nerme nerm jê pîrsî û got: 'Derwêşê min, tu çend sal li Bexdayê mayî?' Derwêş got: 'Evqas sal.' 'Çend sal li Besrayê?' 'Evqas jî li Besrayê, evqas jî li İranê, evqas jî li Misrê û li Yemenê.' Û pê de çû, heta hat Şam û Qudsê. Min gotê: 'Derwêş Baba, ka mu-sade bike.' Derwêş sekinî, min tizbiya xwe derxist û gotê: 'Tizbiya min carek dewir bû, ev cara duymen e ku tizbî li ber xelasbûnê ye, te jî, hê cihê gerên xwe bi nîvî nekiyîe, dixuye ku emrê te çarsed-pêncsed sal in; de rabe bicehi-me here, kurê kerê, virek, teresê qeşmer...'

Serokê hikûmetê, serleskerên Tirk û rojnameyên wan, çendekî berê (ku hê neketibûn başûrê Kurdistanê) digot: "Di bargehîn (qampê) PKK'ê de, nêzîkî sê-çar hezar gerîla hene." Niha jî dibêjin: "Me, çar-pênc hezar kuştine, çend hezar jî, birîndar kirine, çend hezar jî reviyane İranê... û kampa Xakûrkê jî, hê maye, du-sê hezar jî, teslimî pêşmergeyan bûne û şer jî hê dom dike. Bîst mehmet-cîk mirine, heşte-not heb jî birîndar in." Televizyona wan jî, du-sê roj berê, di nexweşxaneya "Gülhane" yê de, birîndaran nişan dan û wiha gotin: "Di vê nexweşxaneyê de, 8 serbaz (subay) û 265 leşker birîndar in û tedawiya wan didome." (Kî dizane ku di nexweşxaneyê din de jî, bi çend sedan hene). Ger Seydayê Mele Zahir niha sax bûna û guhê xwe bida van xeberên berevajî, hevnegirtî dij û vîj, wê ji wan re jî bigota: De herin lo...

Bi rastî jî, evqas vir nayênen kirin. Gotineke pêşîyan heye, dibêjin: "Xwezi, kî virek bikira, pê re tirek jî bikira."

Serokê PKK'ê jî dibêje: "TC viran dike û ketiye lîlê, xwe çiqas tev dide, ewqas diçe xwarê. Pêşmergeyan jî, nikarin bi me re şer bikin. Çawa be, em birayêñ hev in, em jî dil, li wan naxin, lihevhatina me jî, ne dûr e. Gelê Kurdistanê qehremanî û mîrxasiya gerîla dît. Ev şer û ceng, ji me re pîrr karêñ mezin anî. Stratejiya me ya nû jî, wê çêtir û qenctir be... Di dawî de, wê hemû xayîn û hevkarêñ dij-min, ji Kurdistanê paqîj bibin. Zafer yê me ye."

Hilbijartina Mebûsên Meclîsa Kurdistan li Ewrûpa

Yekda Welat

Hilbijartin ji-bo mebûsên Meclîsa Neteweya Kurdistan germ bûye û pêş ve diçe.

Bi hilbijartina Meclîsa Neteweya Kurdistan (MNK) giyanê serbixwe, serbilind, ji hêza xwe bawer, bi fermî tê damezirandin.

Di nav gelê Kurd û Kurdistanî, li Ewrûpa gotûbêjeke fi-reh û bi can li her maleke Kurd, komele, zanîngeh û hwd. didome û hêdî hêdî dibe xala rojane.

Her mirovêkî ji 23 salî û jîrin dê dikare heta 8'ê Mijdarê xwe ji bo hilbijartina mebûsên Meclîsa Neteweya Kurdistan li Ewrûpa pêşniyar û nişan bide. Ji-bo 20-22'ê Mijdarê gelê Kurd û Kurdistanî dikarin li her cihêkî Ewrûpa dengê xwe bidin.

Komîta amadekirina Meclîsa Neteweya Kurdistan di pirr nivisan û civînan de li ser şert û hoyen hilbijartînê û pêwistîya wê bûyerê diyar kirine. Lewre ji ne pirr gîring e ku bi taybetî li ser wan hoyan were rawestandin.

Lê ditinê gelê Kurd û Kurdistanî, li Ewrûpa li ser hilbijartina MNK çawa ye? Çi gotûbêj li ser MNK çedîbin û rista MNK ji bo diroka Kurdistanê û pêşeroja wê ci ye?

Ku di wan rojan de mirov li nav komeleyen Kurdan li Ewrûpa bigere, mirov êdi dibine ku Kurd li ser du xalan radiwestin: Yek êrişen leşkerên Tirk li başûrê Kurdistanê û dudo ji hilbijartîn û damezi-

randina Meclîsa Neteweya Kurdistan.

Di vê nivîsandinê de em dixwazin hinek gengazî bidin xwendevanê Welat ku dîtinê xwe li ser MNK diyar bikin.

Ibrahim 36 salî ye, li Almanya diji, wiha li ser MNK diaxive: "Cara yekemîn e ku gelê Kurd bi awayekî rast û demokratîk berpirsiyaren gelên xwe bi xwe hildibijere."

Pirr caran gotûbêj çedîbe ku çîma êdi MNK çedîbe û Kurdistan hê rizgar nebûye. Herbî ji Bochumê wiha dibêje: "Ez şas dimînim, hê ji welatê me rizgar nebûye û dîsa ji têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan li derveyi welat berpirsiyaren gel bi demokrasiyekî giranbuha û bi nirx hildibijere. Gel bi xwe biryar dide ka wê kî bibijere. Ku mirov li PLO an ji ANC (African National Kongre) mîze bike, wan rîexistin zêde bi xwe biryar ji bo damezirandina Kongreya Netewî standin û dawî gel bi firehî cihê xwe tê de girt. Lewre ji mirov dikare bêje ku ev statuta hilbijartina MNK di cihanê de nû ye û simbol e ji bo demokrasiyê."

Herkes bi "demokrasiya" dewleta Tirkîye baş dizane. Nêzîki milyonek Tirk li Almanya dijin. Lê nikarin dengê xwe li Almanya ji bo hilbijartîna meclîsa Tirkîye bidin. Mirovku bixwaze dema hilbijartînê dengê xwe bide, divê were Tirkîye û dengê xwe bide û dîsa vegere. Dewleta Tirkîye baş dizane ku nêzîki milyonek Kurd ji li Ewrûpa dijin û ku

derfetek ji bo dengdanê hebe, gelê Kurd wê bide gelê xwe û nade dewleta Tirkîye. Dewleta Tirk ji demokrasiyê ditirse.

Li ser pêwistîya damezirandina MNK Herbijî wiha dibêje: "Ev hilbijartin di diroka Kurdistanê de etapa (koçbera) sêyemîn e. Di diroka Kurdistanê de sê xalîn pêwist hene. Xala yekemîn damezirandina Partiya Karkerê Kurdistan e, xala duyemîn destpêka şerê çekdari ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê ye, êdi xala sêyemîn damezirandina Meclîsa Neteweya Kurdistanê ye. Gelê Kurd idara û qedera xwe dike destê xwe. Ji wî tiştî basit û qîmettir nîn e."

Li ser idara gelê Kurd xwendevanekî Kurd wiha dibêje: "Bi damezirandina MNK "selfdetermination" a rast ji bo Kurdan dest pê dike. Dewletê biyanî tiştîkî nadîn me û divê em bi xwe bawer bin û bi xwe gavên mezin gîring biavêjin. Ku em li hêviya mirov û dewletan bin, em tu car rizgar nabin."

Bangeşî li her bajarê Ewrûpa dest pê kiriye


Her mirovê ku dixwaze we-re hilbijartîn bi moraleki mezin û çalakî bangeşîye (propaganda) dike û kampanya ji bo hilbijartînê pêş ve dimeşînin. Civîn li ser civînan di wan rojan de li her bajaran çedîbin. Bi sed hezaran belavok tê lavkirin. Atmosfer wiha germ bûye ku tu kes li ser hilbijartîna Amerîka ranawest e. Misto li ser wê xalî wiha dibêje: "Me ci ji Clinton an ji, ji Bushe.

XÂÇEPİRS

Çepeast: 1-Ji Rojhîlatê Kurdistanê muzis-yeneki Kurd. Di warê mûzika pirredeng de, xebatêne girîng pêk anye. Bestekarê Senfoniya Helebce ye. Niha ji, di nav HUNER-KOM'ê de, dersêm mûzikê dide û şefitiya orkestrayê ji dike. Ev muzikvanê mezin di wêne de tê ditin. 2-Kîncan didirûn/ Jêzaya mirov 3-Qût ji wê derê têne hêrandin/ Bi ingilizi dinya/ Bextewar, berxwedar 4-Qamış, çiq/ Rewş/ Sembola Sodyûmê 5-Bî erebi avakirin/ Adî/ Kinnivisîna istîxbarata Tirkîye 6-Hevgirêdanek navgîniyê 7-Giyayen hişkîri/ Navekî mîran 8-Heyret û ecîbmâyînê ifade dike (tipa dawî dirêj tê xwendin)/ Navenda dengûbehşan 9-Lî Kurdistanê malbateke bi navûdeng, Şêx Mehmûdê? 10-Xebatkarên aş'an/ Cînavka kesaneyâ yekemîna pirrhejmar

Serejér: 1-Karekterekî tipan (herfan)/ Kin-cek qalind 2-Cemed/ Zarok li wir têne he-wandin 3-Sembola Bromê/ È di nav de tiştek tunebe/ Herdu dengdérén rûvi 4-Îhtîras/ Serbest 5-Bajarekî Fransa/ Hemdem, modern 6-Dîftong, şive 7-È musulman be/ Nebatek, nefel 8-Pergalek muhendisiyê/ Celebek ta, dibiriqe 9-Sembola sıfirê (baqîr) 10-Felq, peşk, par 11-Beşek ji zimanê

Amadekar: Rasto Zîlanî



Hind-Ewrûpi 12-Daçek
BERSIVA XÂÇEPİRSA HEFTİYA ÇÜYİ

Çepeast: 1-Huseyîn Erdem 2-Îsal/ Ra/ Erse 3-Karite/ Avam 4-Îmamok/ Vêl 5-Ran/ RTL/ Na 6-Înca/ Ego 7-VTR 8-Alozi 9-Pirê/ Erê 10-Az/ Limon
Serejér: 1-Hîkari/ Apa 2-USA/ Analiz 3-Sarinc/ Or 4-Elîm/ Avzîl 5-Tax/ Tî 6-Îrem/ Er/ Em 7-Na/ Org/ Fro 8-Aktor/ Ên 9-Rev 10-Drav/ Esmen 12-Me/ La

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12</p

Em bi hev re hîn bibin

2

A B C Ç D E Ê F G H İ Í J K L M N O P Q R Ş T U Û V W X Y Z
a b c ç d e ê f g h i í j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Van navêñ jêr hîn bibe

AGİR

agir

BARAN

baran

CÊR

cêr

ÇÜK


çük

DASÜK

dasük

EWR

ewr

ÊZİNG


êzing

FİL

fil

GARIS


garis

HÊK


hêk

INCAS

incas

İSOT

isot

JÛJÎ


jûjî

KEVİR

kevir

LAMPE

lampe

MAR

mar

NAN

nan

ORDEK

ordek

ZAROKÊN SERHILDANÊ

Di aşxaneyə**we de kijan heye?**

(...) Sendelî hene?

(...) Mêzek heye?

(...) Darek heye?

(...) Kevçî hene?

(...) Çetel hene?

(...) Radyo heye?

(...) Lampe hene?

(...) Filek hene?

(...) Kêr hene?

(...) Sarinc heye?

(...) Çaydank heye?


(...) Çiçek hene?

(...) Tûrên naylonî hene?

(...) Ard heye?

(...) Hêk hene?

(...) Sarî (spageti) hene?



Me nas bike û navêñ me binivîsel!

Em vî tişti pê dikin û ew jî piyê me germ dike.

(.....)

Dema ku baran dibare, em pê dikin.

(.....)

Di ser fanîle de em li xwe dikin.

(.....)

Dema çilmê me tê, em pê paqij dikin.

(.....)

Dema berf dibare em dikin destêñ xwe.

(.....)

Dema sar dibe, em didin serêñ xwe.

(.....)

Em tiştên xwe dikin hundır û didin piştên xwe.

(.....)

Em pereyên xwe dikin hundirê vî tişti.

(.....)

Em lingên xwe tê re dikin û li xwe dikin.

(.....)

Em pê porê xwe xweşik dikin.

(.....)

Em bi vî tişti diranêñ xwe paqij dikin.

(.....)

Tu çi dixwî? Nişana X deyne hundirê parantêzan!

- | | |
|--------------------|-------------|
| () Nan | () Ax |
| () Pîvaz | () Hestî |
| () Goştê bizinan | () Dar |
| () Goştê kûçikan | () Kaxez |
| () Hirmî | () Pênivíş |
| () Zeytûn | () Masî |
| () Goştê hespan | () Mal |
| () Goştê mirışkan | () Hêk |
| () Sol | () Mar |
| () Gore | () Kêzik |
| () Hîngiv | () Şîrberf |
| () Şekir | () Incas |
| () Zebeş | () Lîmon |
| () Kelek | () Gilyaz |
| () Sêv | () Sendelî |
| () Kevir | () Radyo |

Serokê Komeleya Mafêni Mirovan (İHD) Akin Birdal:

'Parastina mirovahiyê rûmeta me ye'

- Birêz Akîn, hûn rêvebirên Komeleya Mafêni Mirovan, ji bo dema pêş ci bernâme amade kirine, li pêş ji bo mafê mirovan weke ci xebatêne we hene, dîtin û ramanêne we ci ne?


Di destpêkê de, Komeleya Mafê Mirovan wê ci xebatê bike, di kongreyê de hate ziman. Di kongreyê de bi rastî û dirûstî qerar hatiye standin. A girîng û ferz ew e ku em vê qerarê derbasî pratikê bikin.

Qerara ferz a ku di kongreyê de hatiye standin ev e: İro li herêmê şerekî neilankirî têye meşandin. ji bo ku ev herba bênav ji holê were rakirin, KMM (Komeleya Mafê Mirovan) li Tirkîyê û li nav qadêna navneteweyî ewê xebatêne xwe bido-mîne. Ev şerê ku li herêmê tê meşandin, ne li gorî hiqûqa şer e. Dewleta Tirk li gorî Peymana Cenewre nameşe. Em bi vê yekê bawer in ku dewleta Tirk, bi vî şerê gemar, bi qedexe û qetliaman êdi vê pirsgirêka Kurd, nikare hal-bike û vî agirî vemirîne. Êdi nema dikare vê têkoşînê û vê dozê bifetisîne. Hikûmetê her tişt hewaleyi ordiyê kiriye. Em dibêjin li ser bingehêke esasi, bi rastî, bi dirûstî, bi biratî û wekhevi gelê Tirk û Kurd li nik hevûdu bijîn. Rojeva Komeleya Mafê Mirovan ya ferz ev e...

- Ji demek dirêj ve ye, bi taybetî, ji Newrozê û hetanî roja iro pêl bi pêl ji alî "hêzên tarî" ve gelek cînat yet pêk hatin, di vê dabaşê de, sekna li ser "hêzên tarî" yê winda, li ser milê KMM wezîfeyeke girîng e, di vê mijarê de hûn ci dîkin?

Komeleya Mafêni Mirovan şahidê qetliama sala 1991'ê ye. Bê súc û bê sebeb, ordiya dewleta Tirk êrîşî ser gelê bêparêz kir. Ev zilm û kotekiya ku li herêmê hate kirin, me li hemû ci-

Birdal:
"Serê ku li herêmê tê meşandin, ne li gorî hiqûqa şer e.
Dewleta Tirk li gorî Peymana Cenewre nameşe. Em bi vê yekê bawer in ku dewleta Tirk, bi vî şerê gemar, bi qedexe û qetliaman êdi vê pirsgirêka Kurd, nikare hal-bike û vî agirî vemirîne. Êdi nema dikare vê têkoşînê û vê dozê bifetisîne. Hikûmetê her tişt hewaleyi ordiyê kiriye."



hanê da belavkirin. Belê li Tirkîyê medya bi teref e, bi rastî û dirûstî peywira çapemiyê pêk naynin. Gotin li Cizîrê gerîla êrîş kiriye û şer deraniye. Qetliama ku li Şirnex jî bû, car din medya bi derewan beyanat da. Belê, li ser cînayetên "hêzên tarî" em zehf radiwestin. Ev ji me re wezîfeyeke girîng e.

Bi xebata me û ya çapemiyâ şoreşger, dewleta Almanya ambargo danî ser Tirkîyê.

- Di çavê dewletê û nîjadperestan de, KMM neyar an jî hevparê réxistinên şoreşger têye xuyakirin. Di hêlekê de endamê we distinîn işkence, komeleya we mifte dikin. Di van

rojên dawî de jî rêvebirên dewletê û hinek sazgehê şovenîst, diben ku, "kîrinên li dîji mirovahiyê, dibin çavan de kesen winda, li girtîgehê bêmafitya ku tê kirin, şoreşvanen ku tene kuştin KMM ji erd hetanî asîmanan fermanê radike. Lî dema leşkerek an jî polisek were kuştin KMM deng jê tê birrîn," bi we ev tewandari rast in?

Ew tewandariyê ku ji KMM re tînin ne rast e. "Yek ji van lîstikên ku li ser me dileyizîn ji alî çapemînyê ve tê meşandin, ev tewandari bê bingeh in. Mêze bike, parastina mafê mirovan di sala 1946 an de li neteveyen Yekbûyî bi maddeyan

tesbit bû û hate îmzikirin. Em jî, li gora vê parastinê û qanûna li Tirkîyê ci bêmafitya ku dibe em li hember in. Dewlet bi topêna xwe, tanq, leşker û polîsên xwe ve, xwe diparêze. Lî gel?.

Li vir kesê ku bê parastin dimîne kî ye? Ev gel bê parêz e, kesê ku heq û hiqûqê wî dîbin piyan de ye. Helbet emê wan biparêzin, ku em wan neparêzin emê kî biparêzin? Ev parastin wezîfa me ye. Li gorî parastina mafê mirovan xwîn wê were sekinandin, hêstirê çavan nema dîbarin, bi vî renğî jiyana mirovan nakeve tallukê. Dewlet, bi van siyaseten xwe yê li dîji mirovahiyê di navbera gelê Tirk û

Kurd de neyartiyê diafirîne. Ku leşkerek li herêmê têye kuştin, li ser Kurdên metropolê zilmê dîbarînin. Zîlma li ser Kurdên Alanya em tev bûne şahid.

- Şerê ku li başûrê Kurdistanê dibe hûn çawa dibînin? Armanca dewleta Tirk ci ye ku bi hemû çekên xwe yê modern, xwe kişandiye wir, gelo wê Başûr dagir bike?

Di destpêkê de ez vê bibêjim. Carekê, êrîşa dewleta Tirk ya Başûr, ihlala qerarê navneteweyî ye, qetliama dewletê yê li Tirkîyê û êrîşa Başûr nézî hev e. Ev li gorî sazûmana mafê mirovan, li diji aşti û insanetiye ye. Dewleta Tirk di vir de taşeron e. A rast împeryalist li wir rol dileyîzin, ji ber vê yekê Tirkîyê ne di destê xwe de ye. Heke împeryalist bixwazin wê dagir bike, Tirkîyê di vir de piyon e.

- Ji bo ku ev xwîn bisekine, di navbera PKK û Tirkîyê de hûn navbeynkarîye difikirin? Heke hûn dest bi vê xebata xwe bîkin, wê banga we ji partîyan re û komeleyen demokratik re jî bibe?

Belê, iro ev pirsgirêkeke ferz e. Der heqê vê dê, me di kongreya xwe ya çaremîn de jî anî ziman û stande qerarê, di destpêkê de emê bangî dewleta Tirkîyê bîkin, emê ewil serî li wan bîdin. Esas di vir de yê ku rola şer dileyîze dewlet e.

Di nav neteweyan û Neteweyen Yekbûyî de, ji bo ku ev xwîn were sekinandin emê li Tirkîyê jî, bi hemû sazgeh û partîyan re xebat û tekiliyên xwe bidomînin.

- Bi we pirsgirêka Kurd ku neyê safîkirin a mafê mirovan wê hal bîbe, rojeva Tirkîyê ci ye?

İro rojeva KMM û Tirkîyê, pirsgirêka Kurdi ye, ku pirsgirêka Kurdi neyê halkîrin, demokrasî an jî mafê mirovan nayê çareserkirin.

Welat

- Li ser navê IMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
- Berpirsiyârê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyârê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres): Başmuşahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyâriya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyâriya Fransa: Amed Jemo • Rue G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ